

DANEZANA TEVGERA DEMOKRATİK A KURDISTANÊ (TDK-TEVGER)/ KÛRTİSTAN DEMOKRATİK HAREKETİ (TDK-TEVGER) BİLDİRGESİ

26th Ocak 2022



Navê Tevgerê

Bi kurmancî Tevgera Demokratîk a Kurdistanê TDK-TEVGER e.
Bi kirdkî (zazakî) Tevgera Demokratîk a Kurdistanî TDK-TEVGER e.
Bi tirkî Kürdistan Demokratik Hareketi TDK-TEVGER e.

TDK –TEVGER, tevgereke eşkere, neteweyî û demokratîk e

TDK-Tevger xwe kevneşopî û berdewamîya tevgera neteweyî û demokratîk ya sedsala dawî ya Bakurê Kurdistanê dibîne. Ango TDK-Tevger, “*Komeleya Pêşketina Kurdistanê*” (Kurdistan Tealî cemîyeyê) û rêxistinên din yên sîyasî, civakî û kulturî ku di destpêka sedsala 20an de li Stenbolê hatibûn ava kirin; Partîya Dekomrat a Kurdistanana Tirkîyeyê (PDKT) û “*Komeleyên Çanda Şoreşgerî yên Rojhilatê*” (Doğu Devrimci Kültür Ocakları – DDKO) ku di nîvê salên 1960an de li Bakurê Kurdistanê hatibûn avakirin; herweha, rêxistinên sîyasî û kulturî yên neteweyî ku li ser bingehê pirrengî û birdengîyê di salên 1970yan de li Bakurê Kurdistanê hatibûn ava kirin, weke mîrîsa dîrokî ya hevbeş ya tevgera neteweyî û demokratîk ya Kurdistanê dibîne û xwe mîratxur û berdewamîya wan rêxistin, komele û tevgeran dibîne.

TDK-Tevger di heman demê de, bi dîroka xwe ya sîyasî û hûnandina xwe ya rêxistinî wêrisdarê PYSKê (Partîya Yekîtiya Sosyalîst a Kurdistanê) û berdewama RSDKê (Rêxistina Sosyalîsta Demokrat a Kurdistanê) ye. Weke tê zanîn; PYSK ji pênc rêxistinan (Kawa, KUK, Têkoşîna Sosyalîst, TSK û YEKBÛN) ku piştî xebatek dûr û dirêj ya yekîtiyan hate damezirandin. PYSKê, damezirandina xwe di 1ê gulana 1996 de bi

belavokekê ji raya giştî re dîyar kiribû. Lê PYSK nebû xwedîyê jîyaneke dirêj û di temûza 1998an de dawî li xebata xwe anî.

Piştî, bi armanca domandina yekîtiyê; bi beşdarîya kadroyên ji kevneşopîyên KUK (Rizgarîxwazên Neteweyî yên Kurdistanê /RNK), TS (Têkoşîna Sosyalîst), TSK (Tevgera Sosyalîst a Kurdistanê) û tevî hinek kadroyên ji rêxistinên din RSDK hate damezrandin. RSDK di qada sîyasî, çandî, demokratîk û civakî de xebata xwe domand û di platformên hevbeş de cîhê xwe girt. RSDK di konferansa xwe ya di 7 û 8ê îlona 2005an de navê xwe guherand û navê TDK-TEVGER (*Tevgera Demokratîk a Kurdistanê*) li xwe kir. Ji ber vê yekê, TDK-Tevger xwedî mîras û kevneşopîya PYSKê ye ku li Bakurê Kurdistanê yekîtiyek sîyasî û rêxistinî ya herî berfireh bû. Ji aliyê din; TDK-Tevger ji bo geşkirina xebata yekîtiya sîyasî û hevkarîyên neteweyî, hem li welêt û hem jî li dervî welêt bi rêxistin û derdorên welatperwer û demokratîk re pêwendîyên xwe domand û di vî warî de, gelek gavên girîng avêt.

TDK-Tevger li ser bingehê rastîya welat û netewe, tevgerê eşkere, netewî û demokratîk e. Ew li dijî sîstema hiqûqa Tirkîyeyê ya ku heta niha hatîye birêvebirin dixebite. TDK-Tevger meşrûtiyeta xwe ya hiqûqî ji doza miletê Kurd yê mafdar û rewa digre. Ew xwe girêdayî nixên xwezayî yên demokratîk û prensîpên hiqûqa gerdûnî yên ku bûye malê mirovahîyê, dibîne. Di xebata xwe de, van nîrx û prensîpan rêber digire. Qada xebata bingehîn ya TDK-Tevgerê, Bakurê Kurdistanê ye. Ew ne li ser bingehê îdeolojîyan, lê li ser esasê rizgarîxwazîya neteweyî û demokratîk dixwaze bi awakî berfireh beşên civatê di nav xwe de bicivîne. Li ser bingehê pîrrengî, pirdengî, xweşbînî û rêzêgirtina bîr û bawerîyên cûda, derîyê wê ji hemû kurd û kurdistanîyên neteweperwer, demokrat, sosyalîst, bawermend, muhafezekar û hwd re vekirîye. Bi gotinek din; TDK-Tevger, kurd û kurdistanîyên ku Kurdistanê wek welat, neteweya Kurd wek milet, alaya Kurdistanê wek sembola nîştîmanî û avakirina serxwebûna Kurdistanê jî di nav de, "*mafê çarenivîsa xwe bi destê xwe tayinkirinê*" qebûl dike, bi rêxistin dike.

TDK-Tevger li gor şert û mercên pêşerojê wê bixwaze partîyek sîyasî, demokratîk û eşkere ava bike û ji bo mafên neteweyî û demokratîk yên miletê Kurd û pêkhatyên etnîkî û olî yên Kurdisnanê bixebite. Ji aliyekî, wê bixwaze xebata xwe ya navxweyî geş û xurt bike; ji aliyê din jî wê ji bona geşkirina xebat û hewldanên yekîti, hevkarî û platformên hevbeş bixebite.

TDK-Tevger, li gel xebatên ji bona hevkarî û platformên hevbeş yên neteweyî, demokratîk û kulturî; xebatên ji bo avakirina yekîtiyek sîyasî û rêxistinî jî wezîfeyek xwe ya esasî dibîne û di vî warî de amade ye ku çî bikeve ser milên wê pêk bîne.

TDK-Tevger, ji bo bidestxistina mafê perwerdeya bi zimanê dayikê, pêwîstîyê bi platform û xebatên taybetî yên hevbeş dibîne. Divê hemû rêxistin, tevger û dezgehên sîyasî, kulturî û civakî yên kurdistanîyan temsîl dikin, beşdarî nav van xebat û platformên hevbeş bibin. TDK-Tevger wê bi hemû hêz û îmkanên xwe hewl bide ku alîkarî û piştgirîya van xebat û platforman bike. Zimanê TDK-Tevgerê yê fermî, bi du zaravayên kurdî kurmancî û kirdkî/zazakî ye. Lê TDK-Tevger, li gorî şert û mercan, zimanê tirkî û zimanên din yên bîyanî jî bi kar tîne.

Rewşa tevgera neteweyî û demokratîk ya Bakurê Kurdistanê

Di dîroka tevgera demokratîk û neteweyî ya vê sedsalê de, gelek bûyer û pêvajoyên cuda yên serketî û têkçûyî hatin jîyandin. Di seranserê sedsala 20an de, gelek berxwedanên neteweyî û herweha gelek komkujîyên civatî pêk hatin. Di warê sîyasî,

civatî û aborî de, rûxandin û wêrankirinên mezin hatin holê. Miletê Kurd êş û azarên giran kişand û tevgera neteweyî û demokratîk derbeyên mezin xwar. Pêwendîyên di nava pêvajoyên sîyasî û di nava neslan de, hatin qut kirin. Her neslekî, çi bigre ji nû ve dest bi xebatê kir. Lê tevî van qirkirin, êş û rûxandinên giran yê seranserî sedsala 20an jî daxwaza azadî û serxwebûna Kurdistanê û yekîtîya milletê Kurd ji holê nehat rakirin.

Piştî komkujî û hovîtiya dewleta Tirk ya li dijî milletê Kurd û rûxandina serhildana neteweyî ya Dersimê ya sala 1938an, Bakûrê Kurdistanê demekê kete nav bêdengîyek dûr û dirêj. Lê *"gîha di bin kevîran de namîne"*; di nivê sedsala 20an de, welatparêz û rewşenbîrên kurdan dest bi hewldanên weşana hinek kovar û rojnameyan kirin û ketin nav lêgerîneke nû. Di encama van hewildan û lêgerînan de, di 11ê temûza 1965an de, bi awakî veşirtî li Dîyarbekirê, Partîya Demokrat a Kurdistanê Tirkîyê – PDKT hat ava kirin.

Pêşketinên ku bi bûyera 49an û doza 23an dest pê kir û bi dû wê re damezrandina PDKT, Mîtingên Rojhelatê yê sala 1967an û avakirina DDKOyan destpêka pêvajoyek nû diyar dikir. Ew bêdengî û ewrên reş û tarî hêdî hêdî belav dibûn. Pêşketinên ku di nivê salên 1970yî de dest pê kirin, berdewama vê pêvajoyê bûn. Tevgera neteweyî û demokratîk ya Bakûrê Kurdistanê, di warê rêxistinîya serbixwe û Kurdistanê de ku bi PDKT û DDKOyan ve dest pê kiribû, di salên 1970yî de berfirehtir û geştir bû. Li ser bingehê pirdengî û pirrengîyê, bi îdeolojî û nêrînên sîyasî yê cuda gelek grûp, rêxistin û partîyên nû yê kurdan hatin ava kirin. Di vî warî de, pêvajoya salên 1970yî di dîroka nêzîk ya tevgera demokratîk û neteweyî de cîhekî girîng digire. Herweha, gelek nerînên bingehîn yê tevgera neteweyî û demokratîk ya Kurdistanê, di vê pêvajoyê de, ango di navbêna salên 1965 û 1980yê de, hatin afirandin. Tercîhên îdeolojîk çî dibin bila bibin, ew bîr û bawerî weke nerînên hevbeş yê tevgera Kurd şêkil digirtin. Qebûlkirina Kurdistanê weke welatekî kolonî û perçekirî, mafê milletê Kurd yê çarenivîsa xwe tayinkirinê, avakirina federasyon, serxwebûn û yekîtîya Kurdistanê weke bîr û bawerîyên bingehîn yê tevgera rizgarîxwazîya neteweyî derdiketin pêş. Ev bîr û bawerî ji aliyê raya giştî ya welatparêz û şoreşger ve dihat qebûl kirin û roj bi roj berfirehtir û geştir dibûn.

Bêguman, di dema salên 70yî de, di warê îdeolojîk û sîyasî de, hinek xeletî û kêmanîyên berbiçav jî hatin kirin. Di serî de, şêkilgirtina bi navendên îdeolojîk yê navneteweyî ve girêdayî, rê li ber pirs û pirsgerêkên mezin vedikir. Ji ber ciwanîya tevgerê, bêtecrûbetîya kadroyên pêşeng, geşbûyîna meylên çepîtî û demdeman pêkhatina kiryarên provokatîf, bûn sedemên gelek şaşî, çewtî û xetayên mezin.

Civata Bakûrê Kurdistanê, heta salên 1980yî teva ku di warê aborî û civakî de, di nav pêvajoyeke lezgîn ya guherandinê de bû jî civateke girtî bû. Lê teva ku Bakûrê Kurdistanê bazareke kolonî û girtî bû jî bi taybetî di warê çandinî û heywanxwedîkirinê de, têra xwe dikir. Piştî darbeya 12ê îlonê, zilm û zordarîya desthilatdarîya dewleta kolonyalîst û faşîst ya dewleta Tirk û destpêkirina şerê çekdarî yê ji aliyê PKK ve, rewşa Bakûrê Kurdistanê û tevgera rizgarîxwazîya neteweyî xist nav qonexek nû ya dijwar. Şer û encamên vî şerî, sîyaseta ku dewletê di wê demê de xiste jîyanê, ew îstîqrara nispî ya ku hebû jî xera kir; di warê aborîya xwezayî, civatî, demografîk û çandî ya civata Bakûrê Kurdistanê de birînên mezin vekir.

Sîyaseta dewleta Tirk ya dagîrker, înkâr, asîmlasîyon û komkujîyê ya li ser milletê Kurd û Kurdistanîyan, herweha sîyaseta û awayên xebata PKKê ya ji salên 1980yî û vir de, li Bakûrê Kurdistanê tahrîbatên mezin pêk anîn. Bi hezaran gundên Kurdistanê hatin rûxandin û bi milyonan kurd koçberî metropolan û dervî welêt bûn. Divê di vî warî de, li ser bingehê rastîya bûyeran, lêkolînên berfireh, objektîf û ciddî bêne kirin. Li gorî aghadarîyên vê gavê hene, tê texmîn kirin ku di nav 35-40 salan de, bi qasî 5 hezar

gundên Kurdistanê hatine şewitandin û wêrankirin; zêdeyî 5 milyon kurd û kurdistanî, bi darê zorê ji ser ax, mal û mulkên xwe hatine koçberkirin. Ji ber vê yekê, ne bi awakî xwezayî be jî civata Kurd bûye civateke bajarî û nifûsa mezin ya kurdan, êdî li bajarên dijîn. Di seranserê vî şerî de, bi dehhezaran hektar daristanên Kurdistanê hatine şewitandin û gelek şûnwarên kevnare û dîrokî hatine rûxandin. Bi bikaranîna çekên kîmyayî bi awakî berfireh û balkêş, xwezaya Kurdistanê hatîye xerakirin û niha jî ev xerakirin û wêrankirinên mezin berdewam dikin. Di warê sîyasî, civakî, aborî û derûnî de, gelek pirs û pisgirêkên mezin hatin holê ku tevn û mîzana civata Kurd serûbinî hevdu kirîye.

Di pêvajoya vê koçberîya berfireh de, sê xelekên ber bi çav derdikevin holê: Yek, koçberîya ji gundan ber bi bajarên Kurdistanê; dudu, koçberîya ji gund û bajarên kurdan ber bi metropolên Tirkîyeyê û sisê, koçberîya ber bi Ewropayê û dervî welêt ve ye. Gelek bajarên Kurdistanê, ji ber vê koçberîya ji gundan hatine, êdî nayên naskirin. Bêkarî, hejarî, xizanî û pirsgirêkên ji ber van sedeman, rê li ber pirsgirêk, kaos û tevlihevîyên mezin yên civakî vedikin. Di vê pêvajoyê de, bi mîlyonan koçberên kurd û kurdistanîyan li bajar û bajarokên Tirkîyeyê cîwar bûn. Derdorên gelek metropol û bajarên Tirkîyeyê, bi şênî û rûniştvanên kurdan ve hatine dagirtin. Kurd li van deveran, bi diravên herî kêr û di karên herî giran û xerab de têne xebitandin.

Di vê pêvajoyê de, ne tenê mirov koçber bûn; herweha sermîyanekî mezin û gelek kesên zane, rewşenbîr, sîyasetmedar, xwendekar, nivîskar û pisporên jêhatî jî mecbûr man ku dev ji welêt berdin. Li Kurdistanê, karsazîyên sînorkirî yên dewletê û kesan yan bi tevayî hatin girtin, yan jî gelekî paş de ketin. Hinek hilberîn û bazirganîyên herêmî çî bigre ji holê rabûn. Bi awakî giştî tîicaret û bazirganîya Kurdistanê û bi taybetî jî li derên ku şer bêtir lê hebû, gelên Kurdistanê di warên aborî, çandî û heywanxwedîkirinê de gelek zerar û zîyanên mezin dîtin.

Di pêvajoya vî şerî de, demografîya welêt bi dijwarî birîndar bû. Sîyaseta dewletê ya ji bo kavilkirin û bêmirovhiştina hinek herêm û gundên Kurdistanê, bi giranî bi ser ket. Siyaseta PKKê û rakîşandina şerê ber bi bajarên ve jî di serketina vê siyaseta dewletê de, zemînek taybetî pêk anî û roleke neyînî lîst. Di vî şerê ku weke "Şerê hendekan" dihate bi nav kirin de, di serî de gelek cîwarên Diyarbekir, Cizîr, Şirnex, Nisêbîn gelek bajar û bajarokên Kurdistanê hatin rûxandin û wêran kirin. Di van şeran de, bi hezaran ciwanên kurdan hatin şehîd kirin. Bi sedhezaran mirov hatin koçber kirin. Ev şerê ku gelek herêm û gundewar kavil kir û bê mirov hişt; vê carê jî bi "Şerê hendekan" gîhaşt wê asteya ku bajar û bajarokan Kurdistanê bê mirov bihêle.

Di jîyana civatekê de, birîna herî mezin ku nayê dermankirin, koçberîya bi darê zorê ye. Ev rûxandinên di warê mirovî, civatî, çandî û exlaqî de rê li ber dejenerasyoneke berfireh vekir; rûmetên civatê hejar kir, nexweşî û tengezarîyeke civatî afirand. Ji nû ve avakirina mîzanên navxweyî yên nav mîletê Kurd û kurdistanîyan, projeyên mezin, têkoşîn û xebatên dijwar û demdirêj dixwaze.

Asîmîlasyona ku di van salên dawî de her ku diçe diwartir dibe, li ser ziman û nasnameya kurdî zerar û tehrîbatên pir mezin çêkirîye û mixabin ev pêvajoya malkambax hê jî berdewam dike. Divê em qebûl bikin ku sîyaseta dewleta Tirk ya di warê asîmîlasyonê de, di astek pir bilind de bi ser ketîye. Îro li Bakûrê Kurdistanê bikaranîna û parastîna ziman û kultura kurd û kurdistanîyê, pirsgirêkek gelek mezin e. Lewra mîletê Kurd û pêkhateyên kurdistanê, li Bakûrê Kurdistanê di warê ziman û kulturê de, bi jenosîda asîmîlasyonê ve rû bi rû ne. Kurd û kurdistanî her roj ji axaftina bi zimanê xwe û ji jîyana bi kultura xwe bi dûr dikevin. Loma jî divê tevgera neteweyî û demokratîk

bi tedbîrên lezgîn, esasî, bi bandor û bi programek taybetî hewl bide ku pêşîya vê pêvajoya jenosîda asimîlaysyonê bigire. Di vî warî de, çî bikeve ser milên TDK-Tevgerê, wê li gorî hêz û îmkânên xwe bi cîh bîne.

Dewleta Tirk, bi vê plana xwe ya piralî û berfireh, ji alîyekî dixwaze tevgera rizgarîxwazîya neteweyî terorîze bike û çavên xelkê bitirsîne; û ji alîyê din jî dixwaze bawerî û hêvîya xelkên Kurdistanê ji doza neteweyî û demokratîk bitefîne. Teva vê yekê jî dînamîkên zindî yên serxwebûn û azadîxwazîya civata Kurd û avakirina desthilatdariya Federal ya Herêma Başûrê Kurdistanê, heta radeyekê dibe asteng li pêşîya vê stratejî û projeya dewleta Tirk. Lê dewleta Tirk jî vala nasekine, ji bo statuya Başûrê Kurdistanê ji holê rake, çî ji destê wê tê dike. Bi vê armancê, êrîş û dagirkerîya dewleta Tirk ya bi behaneyê hebûna PKKê li Başûrê Kurdistanê bêrawestî, berdewam dike. Sîyaset û helwesta PKKê ya dijminatî û nenaskirina Hukûmeta Federal ya Başûrê Kurdistanê jî rê li ber vê sîyaset, êrîş û dagirkerîya dewleta Tirk xweş dike.

Li Kurdistanê şîyarbûna neteweyî û sîyasî, bîngêhên civatî yên tevgera neteweyî û demokratîk berfirehtir û stewardîna pêvajoya netewebûna kurdan jî bi leztir dike. Ev şîyarbûn, ne tenê bi Kurdistanê ve sînorkirî ye; di nav kurdên li Tirkîye û dîyasporayê jî pêvajoyek geş ya şîyarbûna neteweyî û sîyasî didome. Di vî warî de, potansîyelek berfireh ya rizgarîxwazîya neteweyî derketîye holê. Ji her çî nê civatê mirov bi awakî girseyî di nav tevgera neteweyî û demokratîk de cîh digrin. Di nav civata Kurd de, daxwazên mafên neteweyî û demokratîk, hewildanên li ziman, kultur û nasnameya kurdî xwedîderketinê, daxwazên jîyanek serbixwe û azad, bi awakî berfirehtir û geştir derdikeve holê.

Di nav refên tevgera neteweyî û demokratîk ya Bakurê Kurdistanê de, îro jî hinek pêşketinên girîng yên sîyasî derdikevin holê û di vî warî de pêvajoyek ji hev veqetandin û cihêtîyê tê jîyandin. Teva hinek xet û rengên ne zelal, bi awakî giştî îro li Bakurê Kurdistanê du xetên sîyasî yên ber bi çav hene. Yek ji vana; xet û sîyaseta entegrasyona bi dewleta Tirkîyeyê re û kedîkirina milletê Kurd e; ya din jî xeta neteweyî û kurdistanî ye.

Îro, yek ji erk û wezîfeya tevgera neteweyî ya bîngêhîn jî ew e ku li Bakurê Kurdistanê rê li ber vê stratejî û projeya entegrasyona bi dewleta kolonyalîst, teslîmgirtin û kedîkirina ji bo tirkîyeyîbûnê bigire. Ji ber ku yek ji astengên herî sereke ya li hemberî tevgera rizgarîxwazîya neteweyî û demokratîk, ev projeya kedîkirinê ya tirkîyeyîbûnê ye. Ev sîyaseta dewleta Tirk û hevkarên wê ya entegrasyon û kedîkirinê, bîr û bawerîyên ji bo weletakî serbixwe, miletekî azad û civateke demokratîk jar û hejar dike; serê gelek kurdên welatparêz tevlihev dike, bîr û bawerîyên neteweyî şolî dike. Tiştê herî xerab jî PKK û hinek derdorên bi wê ve girêdayî ne, ev yek kirine sîyasetek sîtratejîk û gelek kurdên welatparêz jî piştgirîya wan dikin. Hê jî gelek ciwanên kurdan ji bo vê sîyaseta teslîmgirtin, kedîkirin û *"komara demokratîk"* têne şehîd kirin. Ev pêvajoyeke paradoksî, xemgîn û tarjîk e. Loma jî divê pêşî li ber vê pêvajoyê bê girtin û xebata ji bo xurtkirina bîr û bawerîyên kurdistanî, serxwebûn û azadîyê geştir û berfirehtir bibin. Li dijî pêvajoya kedîkirin û tirkîyeyîbûnê û ji bo vejîna xurtkirina hedef û armancên stratejîk yên tevgera neteweyî û demokratîk, xebatên teorîk, îdeolojîk, sîyasî û civakî yên xurt û berfireh pêwîst in. Loma jî girîngî û pêwîstîya xebat û têkoşîna ji bo avakirina xetek sîyasî ya kurdistanî ku kurdan weke millet û Kurdistanê jî weke welat bîngêh digre; welatekî serbixwe, miletekî azad û civateke demokratîk armanc digre, niha ji her demê bêtir derdikeve pêş.

Çavkanîyên vê pêvajoya entegrasyon û kedîkirinê, ne tenê bi sîyaseta dewleta Tirkîyeyê, PKK û hevalbêndên wê ve sînorkirî ye. Alîyên wê yên ji derbasbûn û rehên navxweyî ya

tevgera neteweyî û demokratîk ya Kurdistanê tên jî hene. Tevgera neteweyî û demokratîk ya Bakurê Kurdistanê, di salên 1980- 1990î de, di warê sîyasî, îdeolojîk û bîr û bawerîyên stratejîk de kete nav pêvajoyê nû. Înkâr û devjêberdana hinek bîr û bawerîyên esasî û stratejîk yê weke serxwebûn û yekîtiya Kurdistanê dest pê kir. Ev pêvajo, di salên 1990an de berfirehtir û kûrtir bû û îro jî berdewam dike. Di vê pêvajoyê de, dev ji gelek nerînên bingehîn, yê ku di salên 1965-1970an de hatibûn afirandin, hatin berdan. Li gora rewşa gelemperî ya îro, ji dervî hinek rewşenbîr û çend rêxistinên ku marjînal mane; bi awakî zelal ne dîyar e ku bê gelek derdorên sîyasî û rewşenbîrên kurdan çî dixwazin. Gelek kadroyên pêşeng ku di salên 1970an de, di afirandina nerînên tevgera neteweyî û demokratîk ya Kurdistanê de xwedî ked û rolek taybetî bûn jî di nav de, gelek kadirên sîyasî û rewşenbîrên kurdan, çareserkirina pirsê miletê Kurd û Kurdistanê, di nav sînorên Tirkîyeyê (Mîsak-î Millî) de, weke pirsgerêkeke *"mafên nasname û çandî"* dibînin. Îro, bi awakî giştî ji dervî hinek rêxistin, tevger û rewşenbîrên bisînor, gelek rêxistin û derdorên siyasî ji bo miletê Kurd bi rastî çî dixwazin, zêde ne zelal e. Cihê xemgîniyê, bergê û dîmena enî û bereya kurdî bi xwe ye. Rêxistin û kesên ku berê hêzên welatparêz yê Başûrê Kurdistanê bi *"otonomîperestîyê"* rexne dikirin, îro êdî *"otonomîyê"* jî realîst nabînin. Ji alîyê din ve, hêzên Başûrê Kurdistanê ku heta salên 1990î otonomî diparastî, îro armanca herî kêfî federasyonê dibînin. Ev muqayese, bi xwe jî dîyar dike ku bê daxwazên sîyasî yê tevgera neteweyî û demokratîk yê Bakurê Kurdistanê, ji kîjan qonaxê hatiye kîjan qonaxê. Divê li ser sedemên vê yekê baş bê rawestandî û dersên pêwîst jê bêne derxistin.

Di vê pêvajoya îro de, hinek rêxistinên ku bi navê kurdî sîyasetê dikin û gelek kesên di qada sîyasî de *"serê govendê dikişînin"* çareserkirina pirsgerêka Kurdistanê weke *"pîrsa çareserîya kurd"* bazar dikin. Ji bo wan, pirsgerêka xak û welat ji holê rabûye. Li gor hinekan, sîyasetkirina di nav sînorên ku dewletê dîyar kirîye, *"sîyaseta objektîf û rasteqîn"* e.

Divê em tu carî ji bîr nekin ku dewleta Tirk li ser hîmê asîmîlasyon, tune kirin û tirk kirina hemû gelên Anatolya û Kurdistanê hatiye avakirin. Heta ev sazûmana kolonyalîst ya dewletê neyê hilneweşandin, dê ev helwesta asîmîlasyon û tune kirinê bi xurtî berdewam bike. Divê mirov bi dek û dolabên vê dewleta dagirker, kolonyalîst û nijadperest ku carcaran xwe weke komarek demokratîk nîşan dide nexape. Heta dewleta Tirk ji hundur ya jî ji derve bi awakî dijwar neyê zorgekirin û ji hêz û taqet nekeve; tevna wê ya li ser înkâr, asîmîlasyon û tune kirina gelên Kurdistanê neyê rûxandin û mecbûrî guherandinên bingehîn nebe, demokratîzekirina vê dewletê xewn û xeyal e. Divê em careke din bi awakî pir zelal dîyar bikin ku li ser bingehê milet û welat pirsgerêka Kurd û Kurdistanê neyê çareser kirin; wê li Tirkîyeyê demokrasî bi awakî rasteqînî neyê avakirin. Kesên ku çareserkirina pirsgerêka Kurd û Kurdistanê, bi gotina wan *"pîrsa kurdî"* bi demokratîzekirina Tirkîyeyê ve girê didin, di nav şaşî û xapandineke dîrokî de ne; ya jî bi zanebûn dixwazin di nav refên kesên *"komara demokratîk"* diparêzin de, cih bigrin.

Welatekî serbixwe, miletekî azad û civateke demokratîk

Kurdistan welatekî dabeşkirî û kolonîyek navneteweyî ye. Miletê Kurd û pêkhatiyên Kurdistanê yê etnîkî û olî ji hemû mafên xwe yê neteweyî, kulturî û demokratîk bêpar hatine hiştin. Loma jî pîrsa tevgera neteweyî û demokratîk ya Kurdistanê, pîrsa rizgarkirina welatekî kolonî û azadkirina miletekî bindest û pêkhatiyên Kurdistanê ye. Pêvajoya îro ya tevgera Kurdistanê, pêvajoya şoreşa rizgarîya neteweyî û demokratîk e. Divê berî her tiştî, pirsgerêk bi awakî zelal û rast bê bi nav kirin. Loma jî TDK- Tevgera pîrsê, weke pîrsa welatekî serbixwe, miletekî azad û civateke demokratîk dibîne. Heta

ev pirs, li gor vê rastîyê neyê çareser kirin, ne aştî û aramî û ne jî demokrasîya rasteqîn li dewletên dagirkerên Kurdistanê bi cih dibin.

Pirsgirêka Kurdistanê, ne tenê pirsgirêka miletê Kurd e; herweha ev pirsgirêk, ne tenê pirsgirêka Tirkîye, Îran, Iraq û Sûrîyeyê ye. Pirsgirêka Kurdistanê, bi hemû alîyên xwe ve bûye pirsgirêkek herêmî û navneteweyî. Dewletên Yekbûyî yên Amerîkayê (DYA), Yekîtiya Ewropayê (YE), Rûsya û gelek dewletên din, êdî alîyên vê pirsgirêkê ne. Heta ev pirsgirêk, bi awakî dadwerî neyê çareser kirin, wê aramî û aştîyek rasteqîn neyê herêma Rojhilata Navîn.

Armanç û daxwazên miletê Kurd û kurdistanîyan yên stratejîk, serxwebûn û yekîtiya her çar perçeyên Kurdistanê ye. Bêgûman ev armanca bingeîn ya stratejîk, bi awakî hêsan û di demeke nêzîk de, pêk nayê. Ji bo vê armançê xebat û têkoşînek gelek dijwar, demdirêj û sîyasetek realîst ya li gor rewş û mercên pêvajoyê pêwîst e. Lê di vê pêvajoya dûr û dirêj, dijwar û dîrokî de, tevgera rizgarîxwazîya neteweyî, wê di gelek qonax û navqonaxan re derbas bibe. Loma jî TDK-Tevger, tu çareserîyên demkî yên weke otonomîya çandî, otonomîya herêmî, federasyon û hwd red nake. Bervajîya wê, TDK-Tevger, ji bo gihaştina armanca stratejîk ya tevgera neteweyî û demokratîk ya Kurdistanê, girîngîyek taybetî dide hemû destketinên neteweyî û demokratîk yên demkî û navqonaxî. Bi vê çarçeweyê de, TDK-Tevger, bi awakî resmî bikaranîna zimanên dayikê di dibistan û dezgehên resmî de; mafên jîyan û geşkirina çanda kurdistanî jî di nav de, tu destketinan red nake û wan biçûk nabîne. Ji ber ku TDK-Tevger di vê rêya demdirêj û stratejîk de, her destketinê weke pêngaveke girîng dibîne.

TDK-Tevger di rewşa îro de, serxwebûnê armançeke programî û demdirêj dibîne. Ev armanç, xwedî bingehekî dîrokî ye û em di vê bawerîyê de ne ku ev daxwazeke sereke ya miletê Kurd û Kurdistanîyan e. Lê di vî warî de, xwedîyê biryara dawî miletê Kurd û Kurdistanî bi xwe ne. Mafên tu partî û rêxistineke sîyasî tune ku di warê qedera xwe bi çi awayî tayinkirinê de, îradeya miletê Kurd û kurdistanîyan têxe bin îpotekê û programên xwe li ser wan ferz bike. Gava şert û mercên dîrokî hatin amade kirin, wê miletê Kurd û pêkhatyên Kurdistanê bi xwe, bi rêya referandûmeke demokratîk û azad qedera xwe bi destê xwe tayin bike. Referandûma serxwebûnê ya Başûrê Kurdistanê, di vî warî de tecrûbeyek neteweyî û dîrokî ye. Referandûma 25ê îlona 2017î ya Başûrê Kurdistanê dîyar kir ku daxwaza miletê Kurd û kurdistanîyan, dewletek serbixwe ye.

Lê di vê pêvajoya stratejîk û dîrokî de, li gorî şert û mercan, dikare çareserîyên navkonaxî yên weke otonomî û federasyon jî derkevin holê. Ji ber ku li cîhanê, tecrûbeyên federasyon û otonomîyên ku hebûn nîşan dan ku ew ji bo pirsgirêkên neteweyî ne çareserîyên mayinde ne. Yekîtiya Sovyetan, Yugoslavya, federasyon û otonomîyên li Ewropaya Rojhilat û Rojava hebûn, tenê ji bona demeke taybetî bûne çareserî. Li dinyaya îro, pêvajoya ber bi serxwebûnê ve diherike. Ji ber ku bi awakî giştî, daxwazên dîrokî yên neteweyên bindest, ber bi dewletên serbixwe ve ye. Di vî warî de nimûneyeke balkêş ya vê dema dawî jî helwesta xelkê Katalonyayê ye. Teva rewşa wan ya aborî û civakî ya gelekî pêşketî jî xelkê Katalonyayê îradeya xwe ji bo serxwebûnê nîşan da. Ev rewş ji bona miletê Kurd û kurdistanîyan jî derbas dibe.

Rewş û pirsên mafên kurdên ku li metropolan dijîn

Ji ber zilm, zordarî û sîyaseta dewleta dagirker, gelek kurd û kurdistanî neçar man ku dev ji axa bav û bapîrên xwe berdin, koçî metropolan û dervî welêt bikin. Mixabin ji ber helwest û sîyaseta dewleta dagirker û rewşa şerê heyî, ev pêvajoya hê jî berdewam dike.

Bêmirovhîştina Kurdistanê û koçberîya bi darê zorê ku bûye sîyaseta dewletên kolonyalîst; herweha ji ber pirsgerêkên aborî, civatî û hinek sedemên din yê dîrokî, ji Kurdistanê ber bi dewletên cîran ve hertim koçên mezin pêk hatine. Îro, di hinek herêm û bajarên metropolên Tirkîye, Îran, Iraq û Sûrîyeyê de nifûseke mezin ya kurdan heye. Bi milyonan kurd û kurdistanî di serî de li Stenbol, Ankara, Îzmîr, Antalya, Mersîn, Adana, Bûrsa û hwd, li gelek herêmên Tirkîye belav bûne û li van deveran cîwar bûne. Beşek kurdên Anatolya Navîn, ji wan kurdên ku di nav van dused salên dawîn de hatine koçberkirin, pêk tên. Heta li hinek herêman, piranîya nişteci û şênîyan ji kurdan pêk tên. Kurd li herêma Behra Sipî û bi taybetî li bajarên weke Îskenderûn, Adana, Mersîn, Antalya xwedîyê nifûsek mezin in. Koçberî û bi darê zorê koçberkirin, ji ber şerê di salên 1980an û vir de gelekî zêdetir û berfirehtir bûye. Divê em vê rastîyê bibînin ku dewleta Tirk di sîyaseta xwe ya bêmirovhîştina Kurdistanê de, ev şer weke derfetek bi kar anî û bi saya vî şerî, bi giranî bi ser ket.

Bi gelemperî tê zanîn ku kurdên li hinek bajar û herêmên Anatolyayê dijîn, di warê aborî û civatî de, di şertên xirab, dijwar û giran de dijîn. Lê li van deran jî pirsgerêka bingehîn ya nişteciyên kurdan, nenaskirina nasnameya kurdî, mafên xwebirêxistinkirina bi nasnameya kurdî, perwerdeya bi zimanê dayikê, parastîna û pêşdebirina kultura kurdistanî û hwd in. Kurdên li van deran, bi şertên ku nasnameya xwe ya neteweyî înkâr bikin, dikarin ji hinek mafên sîyasî û “demokratîk” feyde bibînin. Kurd û kurdistanîyên ku li metropolan dijîn, ji ber sîyaseta asîmîlasyon û tirkîkirinê ya dewletê; ji ber şertên derûnî û civakî yê giran, bi awakî lezgîntir û diwartir tene bişaftin û asîmîle kirin. Ew ji nasname, ziman, kultur, urf, adet û hêjayîyên xwe yê neteweyî, kulturî û civakî bi dûr dikevin û di nav piranîyê de dihelin. Ji aliyê din ve, kurdên ku li metropolên Tirkîyeyê dijîn, her gav bi çavsofî, çavtirsandin, tehlûkeyên hovane û heta bi kuştinên girseyî jî rû bi rû ne.

Di van salên dawî de, ji ber bilindbûna pêla nijadperestîya Tirkan, li gelek cîyan kurd bûne hedefên êrîşên nijadperestî û hatine kuştin, cîh û warên wan hatine şewitandin. Eger rewş waha berdewam bike, kurdên li metropolan dijîn dikarin bi qetlîam û komkujîyên mezin re rû bi rû bimînin. Ji ber ku dewlet, asîmîlasyon û şiddetê weke alavekî sîyaseta xwe ya kolonyalîst bi kar tîne û teşwîq dike.

Ji bo ku li Tirkîye û welatên bîyanî, merivên kurd bêne parastîn, divê tevgera kurdî xwedî helwest û sîyasetek li gorî vê rewşa nû be. Divê partî, rêxistin, dezgehên sîvîl û demokratîk yê Kurdistanê alîkarî û rêberîya kurdên li metropolan bikin, da ku ew jî bikaribin li gorî şert û mercên deverên lê dijîn, xwe bi rêxistin bikin û biparêzin. Divê haya wan ji hevdû hebin û gava pêwîst bibe, ew di hewara hevdû de herin. Herweha divê rêxistin û tevgerên kurdan jî bi xebatên xwe yê nava welêt û dervî welêt, di vî warî de, bi awakî berdewamî li hemberî vê metirsîyê, raya giştî ya Kurdistanê, xelkên Tirkîye û cîhanê agahdar û şîyar bikin.

Sîyasetmedar û rewşenbîrên kurdan yê li metropolan dijîn, di tevgera neteweyî û demokratîk ya Kurdistanê de xwedî cîh û roleke taybetî ne. Bêguman, wê di pêşerojê de jî cîh û roleke wan ya taybetî hebe. Di destpêka sedsala 20an de, Stenbol navendeke girîng ya sîyaseta tevgera neteweyî ya kurdan bû. Mirov dikare bêje ku tovê tevgera neteweyî ya modern ya Kurd, li vê derê hate avêtin. Piştî salên 1960an jî Stenbol, Ankara û hinek bajarên din yê metropolê, di rêxistinkirina demokratîk û sîyasî ya kurdan de, di warê çapemenî û weşanê de, di amadekirina kadroyan de û di gelek warên din de, xwedîyê cîyekî taybetî bûn. Îro jî girseyek mezin û berfireh ya sîyasî û rewşenbîrên kurdan li metropolên Tirkîye û derveyî welêt dijîn. Loma jî divê tevgera neteweyî û demokratîk ya Kurdistanê, ji bona kurdên li metropolan, derveyî welêt û Yekîtîya Sovyetan berê dijîn, xwedî bername û projeyên taybetî be. Herweha, bûyer û çalakîyên

sîyasî yên li Kurdistanê, rasterast bandorê li ser koçberên kurd yên li Ewropa û bajarên Tirkîyeyê dijîn, dikin. Loma jî TDK-Tevger pêwîst dibîne ku li ser pirs û pirsgirêkên koçberên kurdan yên li bajarên Tirkîye, Ewropa, Yekitiya Sovyetan berê û welatên din dijîn bêne rawestandî û rêyên çareserîyê bêne peyda kirin.

Divê tevgera neteweyî û demokratîk ya Kurdistanê, ji bona mafên kulturî, demokratîk û neteweyî yên kurdên ku li herêm û bajarên cuda yên metropolan dijîn, xwedîyê programek taybetî bin; ji bo çareserîya pirs û pirsgirêkên kurdên metropolan xwedî daxwaz û pêşniyarên zelal bin. Li metropolên Tirkîyeyê, kurd di nav netewe û kêmeteweyan de, bûne kêmeteweya herî mezin. Bi vê maneyê, pirsgirêka Kurd, her weha di warê coğrafîk de jî pirsgirêkeke bingehîn ya Tirkîyeyê ye. Divê ev pirs bivê-nevê bê çareserîkirin. Divê tevgera neteweyî û demokratîk ya Kurdistanê vê pirsê di nav pragrama xwe de bi cih bike û pêşniyarên xwe yên ji bo çareserîyê dîyar bike.

Baş e, rêya çareserîyê çi ye?

Li gorî TDK-Tevgerê, peyman û belgeyên navneteweyî ji bona kêmeteweyên din çî mafan nas dikin, divê ji bo kurdên ku li bajar û bajarokên Tirkîye dijîn re jî ew mafên nas kirin. Ev jî di rewşa kêmeteweyan de, naskirina mafên demokratîk û neteweyî ne. Mafên kulturî, demokratîk û neteweyî yên kurdan û kêmeteweyên din yên li Anadolê û metropolên Tirkîyeyê dijîn, divê di destûra bingehîn de cih bigrin û bi qanûnên pêwendîdar bêne parastîn. Herweha divê ew qanûnan, di pratîkê de werin pêkanîn. Loma jî reorganîzekirina dewletê ya li ser esasê avakirina demokrasîyek berfireh, pîrreng û pirdeng; qebûlkirin û parastîna mafên netewe, kêmetewe, ol û mezhebên hene, weke pêwîstîyek dîrokî derdikeve pêş.

Pirsa yekîtî, hevkarî û xebata hevbeş

Pirsa yekîtîya kurdan pirsgirêke kevn û dîrokî ye. Şaîr û bîrewerê mezin Ehmedê Xanî (1651-1707) jî weke pîrsek girîng û bingehîn li ser vê mijarê rawestîyaye. Ehmedê Xanî li ser pirsê yekîtîyê, di destana gewre ya kurdî Mem û Zînê de weha dinivîse:

Ger dê hebûya me îttîfaqek Vêk ra bikira me înqîyadek

Rûm û 'ereb û 'ecem temamî
Hemîyan ji me ra dikir xulamî

Tekmîl dikir me dîn û dewlet Tehsîl dikir me 'ilm û hikmet^[1]

Ev pirs, îro jî weke pîrsek herî girîng û bingehîn di rojeva tevgera rizgarîxwazîya neteweyî de cihê xwe diparêze. Heta ev pirs, ango pirsê yekîtî û hevkarîyan çareser nebe, wê pêkanîna armanca stratejîk ya tevgera neteweyî û demokratîk ya welatekî serbixwe, miletekî azad û civateke demokratîk bê encam bimîne. Divê rêxistinên sîyasî û demokratîk yên Kurdistanê, rewşenbîr û welatparêzên kurdistanî, bi sîyasetek hevbeş, dest bavêjin vê pêvajoyê û di vî warî de, çî ji destên wan bê bikin. Ji ber ku pirsê yekîtîyê, pîrseke neteweyî ye û hemû beşên civatê eleqeder dike. Weke welat û netewe, rizgarîya me bi yekîtî, hemahengî, rêzgirtin û têkoşîna me ya hevbeş mumkun e. Yekîtîyên hêzên

sîyasî û demokratîk yê heta îro hatine ava kirin, mixabin nebûn xwedêyê jîyaneke dirêj, encameke serketî bi dest nexistin û bersîva pêvajoyê nedan.

TDK-Tevger, bi awakî giştî pirsas yekîtî û hevkarîyên sîyasî û demokratîk, di sê xalan de dibîne:

- 1) Pirsas yekîtî û hevkarîyên hêzên sîyasî û demokratîk yê her perçakî Kurdistanê.
- 2) Pirsas yekîtî û hevkarîyên hezên sîyasî û demokratîk yê her çar perçeyên Kurdistanê.
- 3) Pirsas yekîtî, hevkarî û platformên neteweyî, demokratîk û kulturî yê kurdên dervî welêt (dîaspore). Ango; pirsas di binê banên hevbeş de, yekîtî, hevkarî û civandina komele, federasyon, rêxistinên meslekî, weqifên sivîl û demokratîk yê kurdan; pirsas yekîtîya pispor, nivîskar û lêkolînerên kurdan yê ku li ser ziman, çand û mijarên akademîk xebatê dikin.

TDK-Tevger, li Bakurê Kurdistanê, pirsas yekîtî û hevkarîyan jî di sê xalan de dibîne:

- 1) Yekîtîya sîyasî û rêxistinî ya di navbêna rêxistin, tevger û kadirên sîyasî yê nêzîkî hevdû de.
- 2) Yekîtî û hevkarîyên demdirêj û stratejîk yê navbêna rêxistin û partîyên kurdistanî de.
- 3) Yekîtî û hevkarîyên li ser bingehên armanc û daxwazên rojane yê acil.

TDK-Tevger wê hewl bide ku bi partî, rêxistin û hêzên neteweyî û kurdistanî re, li ser bingehê bîr û bawerîyên ku Kurdistanê weke welatekî kolonî û dabeşkirî, milletê Kurd weke miletekî perçekirî dibîne û mafê çarenivîsa xwe tayinkirinê ji bo milletê Kurd diparêze, yekîtî û hevkarîyên sîyasî û rêxistinî yê stratejîk ava bike. Herweha; TDK-Tevger wê hewl bide ku li gor rewş, pêwîstî û menfeetên tevgera neteweyî û demokratîk, bi hemû rêxistin û dezgehên cihêreng yê civatê re, hevkarî û xebatên demkî yê hevbeş bike.

TDK-Tevger, girîngîyek taybetî dide xebat û kampanyayên gelemperî yê ji bo parastin û geşkirina zimanê kurdî, çanda kurdistanî û parastina kevneşopîyên dîrokî û xwezaya Kurdistanê. Bê guman TDK-Tevger wê li gorî hêz û derfetên xwe bi awakî çalak, beşdarî nav van xebat û platforman bibe.

Li Rojhilata Navîn ku Kurdistan jî di nav de ye, şerekî piralî, plan, berberî û reqabetek gelek mezin di nava dewletên heremê û dewletên mezin de berdewam dike. Ev rewşa aloz û tevlihev, dikare her gav şerekî herêmî û navneteweyî derxîne holê. Rewşa Iraq û Sûrîye ya aloz û tevlihev di holê de ye. Lê dikare her gav pêşketin û bûyerên ku dişibin rewşa Iraq û Sûrîyeyê jî derkevin holê. Herêma Rojhilata Navîn û Kurdistan, ji bo gelek bûyer û guherandinan "*ducanî*" ye û her gav dikare gelek bûyer, pêşketin û guherandinên nû rû bidin. Bêguman ev bûyer û guherandin, di serî de wê tesîrek mezin li Kurdistanê û milletê Kurd bike. Lê rewşa ku niha derketîye holê, bi awakî giştî di feyde û berjewendîyên kurdan de ye. Loma jî divê tevgera neteweyî û demokratîk ya Kurdistanê, li hemberî guherandin û bûyerên ku dikare rû bidin amade be û bikaribe ji keys û fîretên derkevin holê îstîfade bike. Ji ber vê yekê jî hem di nava hêzên kurdistanî yê her perçeyê Kurdistanê de û hem jî di nava hêzên kurdistanî yê her çar perçeyên

Kurdistanê de, pêwîstiya hevkarî, piştgirî û xebat û têkoşîna hevbeş weke wezîfeyek acil ya neteweyî û dîrokî derdikeve pêş.

Pirsa awayên xebat û têkoşînê

Divê pêwendiyên di navbêna armanc, alav û awayên ji bo gihîştina wê armancê de, bi awakî rast û zelal bê zanîn. Armanc, rizgarkirina milletê Kurd û Kurdistanê û avakirina civateke demokratîk e. Bi kîjan rêbaz û alavan wê ev armanc pêk were, weke mijarek girîng, ji berê de li ser tê gotûbêj kirin.

Em dizanin ku jîyan jîndar e, civat dînamîk e, pêşketinên dîrokî bi çivonek in. Tu navgîn û awayên xebat û têkoşînê tune ku di her dem û di her rewşê de bêne bi karanîn. Yê ku navgîn û awayên têkoşînê destnîşan dikin, şert û mercên dîrokî yê wê pêvajoyê ne. Di dîrokê de, gelek awayên xebat û têkoşînê yê weke şerê çekdarî, serhildanên civatî, berxwedanên pasîf, nerazîbûnên sivîl, têkoşînên demokratîk û gelek awayên din hatine bikaranîn.

Awayê têkoşîna çekdarî ya ku heta îro kurdan bi kar anîye, ne tercîhek wî ya ku bi awakî azad hilbijartîye. Mixabin, ev yek li ser wî hatîye sepandin. Milletê Kurd heta niha nebûye xwedîyê rewşek qanûnî û demokratîk û loma jî ew neçar maye ku ji bo bidesxistina mafên xwe yê neteweyî û demokratîk û li hemberî êrîşên dewletên kolonyalîst, rêya têkoşîna çekdarî hilbijêre. Di vê çarçeweyê de, ji bo xweparastîn û bidesxistina mafê azadîya neteweyî, têkoşîna çekdarî ya ku li ser milletê Kurd heta niha hatîye ferzkirin, rêyek rewşa û mafdar e.

TDK-Tevger weke prensîp, ji dervî metodên tundrewî ku di qada navneteweyî de wek çalakîyên terorîst tên dîtin, tu awayên xebat û têkoşînê înkâr nake. Lê di van şert û mercên îro de, TDK-Tevger xebata sereke ya ji bo bidesxistina mafên neteweyî û demokratîk yê milletê Kurd û kurdistanîyan, xebata eşkere, girseyî û demokratîk dibîne. Divê em di rêyên têkoşînên eşkere, demokratîk û girseyî de, misoger û bi biryar bin. Lê, gava hemû rê û rêbazên xebat û tekoşîna eşkere û demokratîk li ber tevgera neteweyî û demokratîk ya gelên Kurdistanê bîn girtin, mafê wî yê xwezayî ye ku ew hêza gelê Kurd û kurdistanîyan bi awakî girseyî û cîhêreng bi kar bîne. Ev jî mafekî rewşa ye. Di gelek belgeyên navneteweyî û herweha di beyannameya mafên mirovî de hatîye dîyar kirin ku ger rê û rêbazên demokratîk li ber xelkekî bîndest bêne girtin, mafê wî heye ku ji bo azadîya xwe serî hilde. Di şert û mercên îro de, bikaranîna xebat û çalakîyên hêza girseyî, divê di vê çarçeweyê de bêne nixandîn.

Dinya, edî ne dinyaya berê û Kurdistan jî ne Kurdistana berê ye. Li hemberî pêşketinên teknolojîk û bikaranîna çekên modern, hinek awa û metodên têkoşînên klasîk êdî weke berê ne bi wate ye. Îro awa, rê û rêbazên têkoşînê hatine guherandin û gelekî dewlementir bûne. Pêşketinên li dinyayê, rewşa navneteweyî, pêşketin û guherandinên li Rojhilata Navîn, bandorek rastûrast li ser Kurdistanê û tevgera neteweyî û demokratîk dike. Weke me berê jî dîyar kiribû; civata Kurd, di giraniyê de êdî civatek bajarî ye. Ev rewşa bi xwe jî di tespît û hilbijartina awayên xebat û têkoşînê de xwedî cihekî girîng e. Loma jî divê tevgera neteweyî û demokratîk ya Kurdistanê li gorî van pêşketin û guherandinan xwe nûjen bike; di warê xebat û awayên têkoşînê de xwe ji nû ve bihûne.

Pirsa avakirina partiyên demokratîk û neteweyî

Li gorî TDK-Tevgerê, di şert û mercên îro de pêşîya vê xetimandina tevgera rizgarîxawzîya neteweyî û demokratîk ya Kurdistanê bi rêya rêxistinîya veşartî û têkoşîna şerê çekdarî ya klasîk ve nayê vekirin; pirs û pirsgerêkên hene, nayên çareser kirin. Di rewşa niha de, şertên vê yên navxweyî û navneteweyî tune ye. Kurdistan êdî ne Kurdîstana berê ye. Civata Kurd, li gora 30-40 sal berê di warê sîyasî, aborî, civatî, demografîk de, li cîhekî gelek cîhê ye. Bi vê ve girêdayî, tevgera neteweyî û demokratîk ya Kurdistanê jî pêvajoyeke nû dijî. Tevgera Kurdistanê piralî bûye û bûye xwediyê potansîyelek gelekî berfireh ku êdî di tixûbên rêxistinîya veşartî de nikare bê sînor kirin.

Li gor rewşa îro û pêşketinên li herêmê, Kurdistanê, Tirkîyeyê û cîhanê, di warê xebat û têkoşîna eşkere û demokratîk de, pêwîstîya kurdan ji her demê bêtir bi nasnameya neteweyî xwebirêxistinîkirinê û geşkirina xebat û têkoşînê ya li ser vî bingehî heye. Divê di vê pêvajoya dûr û dirêj de, heta miletê Kurd û pêkhateyên Kurdistanê bighêjin armancên xwe yên bingehîn û stratejîk, bi daxwazên rojane vê pêvajoyê gav bi gav bihûne. Loma jî divê miletê Kurd û pêkhateyên Kurdistanê di her warên jîyanê de, bi nasnameya xwe ya neteweyî tevbigerin, li ser vî bingehî xwe bi rêxistin bikin. Divê, çî li Tirkîye û çî jî di qada navneteweyî de be, her desketinên xwe bighînin statuyên eşkere û hiqûqî. Ji xwe pêvajoya stewardîna netewebûnê ya ku tê jîyandin jî vê yekê ferz dike.

Ji bo tevgera neteweyî û demokratîk, rêxistinîya vekirî û têkoşîna demokratîk nayê maneya ku mirov rêxistinî û têkoşîna xwe li gor qanûnên hene bi sînor bike. Bervajiyê wê, divê xebat, têkoşîn û rêxistinîyek weha, bi qanûn û hiqûqa heyî ne sînorkirî be; divê ew li ser bingehê nenaskirin û bêkêrhîştina wan qanûnên nedemokratîk û nedadmendî, bê fêm kirin. Weke hemû milet û gelên cîhanê yên azad û serbixwe, mafên gelên Kurdistanê jî heye ku li ser axa xwe, bi awakî azad û demokratîk xwe îdare bike û bijî. Ji bo vê armancê; mafê miletê Kurd û Kurdistanîyan jî heye ku li gorî qanûn û prensîbên hevbeş yên cîhanî û mafên mirovî yên gerdûnî xwe bi rêxistin bikin û bi awakî eşkere û demokratîk xebat û têkoşîna xwe bidomînin.

Bêguman di rewşa îro ya Tirkîyeyê de, ne hêsan e ku gelên Kurdistanê, li ser bingehên nasnameyên xwe yên neteweyî xwe bi awakî serbest û azad bi rêxistin bikin. Di serî de Qanûna Bingehîn, hiqûqa dadmendîya Tirk, qanûn û biryarnamêyên henin, rê û destûrê nadin vê yekê. Lê mafê civata Kurdistanê ya herî pêşî, mafê rêxistinîyê ye û di serî de jî mafê rêxistinîya sîyasî ye. Divê miletê Kurd û Kurdistanî di her warên jîyana civatî de, bi nasnameya xwe ya neteweyî xwe bi rêxistin bikin; dezgehên xwe yên neteweyî û çandî ava bikin û bingehên wan yên neteweyî, sîyasî û hiqûqî pêk bînin. Rewş û pêvajoyê, vê pêwîstîyê derdixîne pêşîya me. Ev, têkoşîneke li hemberî rista hiqûqa kolonyalîstîyê ye û bi qasî têkoşîna çekdarî dijwar e û fedekarîyên mezin dixwaze.

Ji bona ku mirov bikaribe li gorî rewşê îro xebat û têkoşînek berhemdar bimeşîne, divê mirov metod, rêbaz û navgînên nû yên li gorî pêvajoyê biafirîne. Yek ji van jî avakirina partîyek eşkere, neteweyî, demokratîk û girseyî ye. Bêguman, partîyek wehe, divê daxwazên miletê Kurd yên neteweyî û demokratîk armanc bigire û ji rastîya netewe û welêt jî tawîz nede. Di vê pêvajoyê de, ev weke pêwîstîyek girîng derdikeve pêşîya me. Teva hemû astengan jî divê em xebatên xwe yên di vî warî de geştir û berfirehtir bikin. Civata Kurdistanê, xwediyê kadir, potansîyel û stewardîneke berfireh ya neteweyî û demokratîk e ku bikaribe partîyek weha ava bike.

Ev rêyek ji rêyên ku dikare sîyaseta nû ya dewleta veşartî ku li dijî tevgera neteweyî û demokratîk ya Kurdistanê dimeşîne, bêbandor û stewr bihêle; sîyaseta kedîkirinê ya li ser miletê Kurd û Kurdistanîyan bişkîne; û potansîyela neteweyî û demokratîk ya dorpêçkirî, ber bi armancên rast ve biherikîne. Bêguman partîyek weha, divê nebe alat û

bazirgananiya hinek kes û derdorên ku tenê bixwazin herin meclîsa dagirker. Divê partîyek weha, partîyek neteweyî, demokratîk, girseyî ya xebat û têkoşînek şoreşgerî be; xwedîyê sîyasetek serbixwe û bi şexsiyet be; li hêjayîyên tevgera Kurdistanê yê demokratîk û neteweyî yê hevbeş xwedî derkeve û wan bihêz bike.

Di vî warî de, bi awayekî giştî rêxistin, tevger û derdorên sîyasî yê Bakurê Kurdistanê di nav lêgerîn û hewldanek berbiçav de ne. Di van salên dawîn de, damezrandinên hinek partî û dezgehên bi nasnameya Kurd û Kurdistanê, hewildan û pêngavên girîng in. Partîya Azadîya Kurdistanê (PAK), Partîya Sosyalîst a Kurdistanê (PSK) Partîya Demokrata Kurdistanê Tirkîyê (PDK-T) û Partîya Komunîst a Kurdistanê (KKP) bi awakî eşkere û resmî hatin avakirin. Herweha, divê pêvajoya HEP, DEP, HAK-PAR û xebatên partîyên legal yê din, bi awakî gelemperî û birfireh bêne nirxandin. Ji tecrûbe û alîyên wan yê serketî bêne îstifade kirin û ji şaşî û kêmasîyên wan jî dersên pêwîst bêne derxistin.

Di warê pirsên partîyên vekirî û eşkere û programên wan de, hinek derdorên sîyasî *"jêrnasnametîyê"* û *"hinek mafên çandî"* têr dibînin. Ev derdorên ku di nav sînorên ku dewletê dîyar kirîye tevdigerin, di eslê xwe de potansiyela neteweyî û demokratîk bi sîyaseta dewletê ve girê didin. Eşkereye ku di xebat û têkoşîna welatekî kolonî û miletekî bindest de, sîyasetek ku serxwebûnê wek armanca stratejîk nede pêşîya xwe, dûr ya jî nêzîk wê xizmetê ji sîyaseta dewletên dagirker re bike. Hinek derdorên sîyasî jî armancên bingehîn û stratejîk yê miletê Kurd û kurdistanîyan tenê bi programkirina otonomîya kulturî, otonomî û federasyonê ve sînor dikin û pêşeroja miletê Kurd û kurdistanîyan ji niha de dixin bin îpotekê.

Pirsa zimên û zaravayên kurdî

Kurdistan welatekî di nav çar dewletên kolonyalîst de hatîye dabeşkirin, Miletê Kurd û pêkhatiyên Kurdistanê ji dervî îradeyên xwe di nav çar sînorên sîyasî û sînî de ji hevdû hatine veqetandin. Ji ber vê rewşê, miletê Kurd û kurdistanî di her warê jîyanê de, rû bi rûyî gelek pirsgerêk, trajedî û karesatan bûne û îro jî ev rewş weha dom dike. Rewşa her perçeyê Kurdistanê ya sîyasî, civatî û aborî di bin şert û mercên welatên dagirker de û bi awakî ne xwezayî şikil û fesal girtîye. Hem di nava perçeyan de û hem jî her perçe di nava xwe de, di warê sîyasî, aborî, civatî, ziman, zarava, ol, mezheb, çand û hwd de, gelek cudahî derketine holê. Vê rewşa ku ji kolonyalîtiyê mîras maye, ji bo îro û pêşerojê, sersedem û çavkanîya pirs û pirsgerêkên giran in. Mixabin tevgera neteweyî û demokratîk ya Kurdistanê, pirsgerêk û rûxandinên ji vê rewşê dihatin, bi awakî ku pêwîst bû nedît û ji bo çareserîya van pirsgerêkan sîyaset û programek li gorî vê rewşê pêşkêş nekir.

Divê em pirs, pirsgerêk û cudahiyên xwe bi awakî zelal bibînin, gotûbêjan li ser wan bikin û rêyên çareserîyê ji wan re peyda bikin. Yek ji van pirsan jî pirsê zaravayên Kurdî û sîyaseta di vî warî de ye.

Weke tê zanîn, zimanê kurdî ji çar zaravayên bingehîn (kurmancî, soranî, kirdkî/zazakî û hewramî) pêk hatîye. Herweha, her zarava di nav xwe de xwedîyê devokên cuda yê herêmî ne. Li Rojhilatê Kurdistanê û Başûrê Kurdistanê soranî, hewremanî û kurmancî, li Rojavayê Kurdistanê kurmancî, li Bakurê Kurdistanê kurmancî û kirdkî/zazakî tê peyivandin. Yek ji van zaravan jî ne di wê rewşê de ye ku kurd hemû bikaribin bi vî zaravayî ji hevdû fêhm bikin. Yek ji sedemên bingehîn yê afirandina pirsgerêkên pêvajoya neteweyîya kurdan de jî ev e.

Pirsek ji ji pirsên girêng yê zimanê kurdî jî pirsê alfabe yê. Mixabin, kurd hîna jî nebûne xwedîyê alfabekek hevbeş. Rojhilat û Başûrê Kurdistanê alfabe ya erebî, Bakurê Kurdistanê û Rojavayê Kurdistanê alfabe ya latînî bi kar tînin. Kurdên ku di nava sînorên Yekîtiya Sovyetan ya kevn de dijîn, heta dema nêzik alfabe ya kirîlî bi kar dianîn, îro bi giranî alfabe ya latînî bi kartînin.

Divê tevgera neteweyî û demokratîk, di warê alfabe, ziman û zaravan de, xwedîyê sîyasetek zanistî ya hevbeş be. Di vî warî de, karekî mezin û taybetî dikeve ser milên zimannas, rewşenbîr, lêkolîner û nivîskarên kurdan. Berê li Bakurê Kurdistanê, piraniya rêxistinên kurdan di bernameyên xwe de dinivîsandin ku *“Li Kurdistanê zimanê fermî wê Kurdî be; wê xebatê bê kirinê ku ji çar zaravayan zimanekî hevbeş bê afirandin.”* Bêguman ev nerînek şaş û ji zanestîyê dûr bû. Divê bêyî ku em serî li rêyek çêkirî û zordanê bidin, em hewl bidin ku zaravayên zimanê kurdî nezikî hevdu bikin. Divê em vê yekê, bikin sîyaset û di vî warî de dest bi xebatên zanestî û pêwîst bikin. Di vî warî de, yek ji gavên girêng jî ew e ku di pêşerojê de kurd bikaribin li ser alfabekek hevbeş li hevdu bikin.

Li Bakurê Kurdistanê, kurmancî û zazakî, du zaravayên kurdî yên xwedîyê yek maf û statuyê ne. Eger mirov giraniyê bide yekî ji van û yê din îhmal bike, ev dikare di laşê civat û zimanê kurdî de birînên kûr veke. Li Bakurê Kurdistanê, li cihên ku kurmancî di piraniyê de ye, di perwerde û dezgehên rêvebirinê de, divê di dereceya pêşîn de kurmancî esas bê girtin; lê li dibistanan perwerdeya bi zazakî mecbûrî be. Li cihên ku kirdkî/zazakî di piraniyê de ye, di perwerde û dezgehên rêvebirinê de, divê di dereca pêşîn de kirdkî/zazakî esas bê girtin; lê li dibistanan perwerdeya bi kurmancî mecbûrî be. Li Bakurê Kurdistanê, di warê ziman, zarava, çand û perwerdeyê de, divê li ser vê bingehê sîyaset û programek objektîf bê avakirin û birêvebirin.

Pirsa pêkhatiyên Kurdistanê

Civata Kurdistanê ligel milletê Kurd civateke ji grûpên etnîkî, olî, mezhebî û jêrnasemeyên cuda pêk hatîye. Li Kurdistanê, bi kurdan re grûpên etnîkî yên wek ermenî, asûrî, ereb û tirk jî dijîn. Di warê olî de, giraniya kurdan muslumanên sunî û şafîî ne. Kurdên elewî (Ehlî Heq/Rayî Heq), di warê olî û mezhebî de, piştî sûnîyan grûpa baweriyê ya herî mezin e. Lê civatên weke êzîdî, fileh, cîhû û mirovên ji olên din jî li vî welatî dijîn. Divê em cudahiyan li Kurdistanê weke dewlemendiyekê bibînin û di warê etnîkî, dîn û mezheban de xwedîyê sîyaset û programek zelal bin. Divê mafên etnîkî, ziman û kulturî yên hemû pêkhatiyên Kurdistanê bên qebûlkirin, sîyaset û programek ku vana têxe bin ewlekarîyê bê pêkanîn. Pirsgerêkên Ehlî Heq/ Rayî Heq û Êzîdîtîyê, pirsgerêkên girîng yên ku heta niha hatine îhmal kirin. Herdu pirsgerêk jî her ku dihere bêtir dikeve rojeve û divê bi awakî lezgîn bêne çareser kirin. Siyasetê înkâr, asîmîlasyon û tirkîkirinê ya li Tirkîyeyê di warê ol, mezheb û bawerîyan cihê de jî gelek rûxandin û zêrên mezin pêk tîne. Di rastîya xwe de, bawerîya ku divê weke Ehlî Heq/ Rayî Heq bê rave kirin, bi zanebûnê weke *“Elewîtîyê”* tê bi navkirin. Dewlet hewil dide ku bi rêya Bektaşîyê, vê baweriyê entegreyî îdeolajîya *“Îslametîya Tirk”* bike. Serokatîya Karûbarên Diyanetê ku xwedîyê aborîyeke gelek gewre û karmendan e, di vî warî de rolek mezin ya neyînî dilîze. Karesat û komkujîya DAIŞê ya li Şingalî carek din diyar dike ku Êzîdî, Ehlî Heq û baweriyên din yên li Tirkîye û herêmê li hemberî metirsîyek mezin rû bi rû ne. Divê pirs û pirsgerêkên elewîtî û êzîdîtîyê bêne gotûbêj kirin û ji wan re çareseriyên rasteqîn bêne peyda kirin.

Li Kurdistanê kesên xwedî baweriyên ehlî heq û elewîtîyê ne, ligel zilma neteweyî û sîyasî, ji aliyê olî û mezheban de jî zilmê dibînin. Di pêvajoya dîrokê de, zordarî û cûdahîya di nava *“elewîtî û sûnîtîyê”* de birînên kûr di laşê civatê de vekirine. Ji bo

pêşîlêgirtina vê zoradarîyê û rakirina cudahîyên nava "elewîti û sûnîti" yê, divê lêkolînên zanyarî, xebatek xurt û berfireh bê kirin; ji pirsgirêkê re çareserîyek rast bê dîtin. Weke nîjad kurdbûna elewîti û êzîdîtiyê, ji bo xweifadekirina gelek kesên elewî û êzîdî dikare têr neke. Civat mekanîzmeyek zindî ye ku ji gelek kesên xwedî nasname û jêrnasnameyên cihê pêk tê. Divê em li hemberî hemû kêmteweyan, jêrnasname, ol û mezheban bi heman pîvan û mesafeyan tevbigerin.

Pirsa jîngeh û xwezaya Kurdistanê

Dewleta Tirk li ser bîngehê înkâr, asîmîlasyon û qirkirina milletê Kurd û kêmteweyan hatîye avakirin. Hemû serhildan, berxwedan û tevgerên milletê Kurd yê neteweyî bi awakî hovane hatin tefandin. Lê encam û bandora vê sîyaseta nîjadperest û dagirkerî bi vî awayî jî sînorkirî nemaye. Di vî şerê jîholêrakirinê de, bi çekên giran û kîmyawî gelek şûnwarên dîrokî, jîngeh û xwezaya Kurdistanê jî hat şewitandin, rûxandin û wêrankirin. Piştî damezrandina Komara Tirkîyeyê, gelek navçeyên Kurdistanê hatin mayin kirin. Lê ev dewlet, êdî bi vê yekî jî nayê ser û seranserê sînorên navbêna kurdan bi dîwarên bilind dihûne û dixwaze hemû pêwendîyên di navbêna herçar perçeyên Kurdistanê bi temamî ji holê rake.

Vê sîyaseta dewletê ya rûxandin û wêrankirinê ku bi dehsalan e berdewam dike, di van salên dawîn de diwartir û berfirehtir bûye. Di encama sîyaseta dewleta Tirk ya "bêmîrovhîştina Kurdisatanê" de, gelek gund, bajar, bajarok û herêmên Bakurê Kurdistanê hatine rûxandin û wêran kirin. Dewleta Tirk, vê sîyaseta xwe, bi hemû îmkânên xwe, îro li Başûr û Rojavayê Kurdistanê jî dixîne jîyanê.

Dewleta Tirk, zerara ku daye dewlemendîyên me yê dîrokî, jîngeh û xwezayê, gelek mezin û berfireh e. Di nava van 30-40 salên dawîn de, bi destê dewletê û bi awakî sîstematîk şewitandina daristanan, rewşa seqa, avûhewa û ahenga xwezaya welatê me xera kirîye. Ev bûye sedemê tunekirina gelek cûreyên, gul, çiçek, şînkayî û heywanên kovî û rêyek mezin li ber herifandina axê vekirîye. Bi çekirina bendav û golan, li gelek deran şûnwarên dîrokî yê li Kurdistanê, di bin avê de hatine hîştin. Gelek navçe û deverên ku bi kêrî çandinîyê tî jî binav bûne.

Parastîna mîras û rûmetên dîrokî û geşkirina têgehîştina jîngeh û hawîrdorê, li tevayê cîhanê bûye berpîrsîyarî û wezîfeyek girîng. Tevgera neteweyî û demokratîk ya Kurdisatanê jî divê ji bo parastîna û geşkirina mîras û hêjayîyên dîrokî, çandî û herweha parastîna jîngeh, xweza û erdnîgariya Kurdistanê, sîyasetek berbiçav biafirîne û di vî warî de gelê me tê bighîne. Di vî warî de, pêwîstî bi lêkolînên zanyarî û programek perwerdeya têgihîştin û hişmendîyek neteweyî û dîrokî heye. TDK-Tevger, wê piştgirîya xebat û hewldanên di vî warî de bike û li gorî hêz û îmkânên xwe di nav wan de cih bigre.

Pirsa jinan

Weke di pêvajoya dîrokê de, îro jî pirsgirêka jinan yek ji pirsgirêkên civatê yê bîngehî e. Di dîrokê de, bîngeha newekhevîya di navbêna jin û mêran, bi sîtemkarî û kedxwarîya di navbêna jin û mêran de dest pê kirîye. Jin di pêvajoya dîrokê de, weke malekî şexsî hatîye qebûl kirin. Ji bo ku ew jin in, tûşî zilm, zordarî û zahmetîyên mezin bûne û mafên wan bînpê bûye. Mixabin îro jî zilm, zordarî, kedxwarî û sîtemkarîya li ser jinan berdewam dike.

Di civata Kurdistanê de jin, tevî zilm û zahmetîya neteweyî û çînî, ji bo ku weke cins jin in jî, ji gelek mafên xwe yê bingehîn bêpar dimînin. Li gelek deverên Kurdistanê, kevneşopên weke qelen, marbirîna pêçekê, bi zorê zewicandin, kuştinên namûsê, ji mîrasê bêpar hiştin, lêdan, biçûkxistin, zilma aborî û civatî ya li ser jinan, hîna jî berdewam dike.

Teva şert û mercên gelek zor û giran, di xebat û têkoşîna neteweyî û demokratîk ya Kurdistanê de, cîyekî gelekî girîng ya jinan heye. Di têkoşîna rizgarîxwazîya neteweyî de, jinan her dem mil daye milên mêran, bûne hevparên qedera wan û heta ji mêran bêtir jan û azarî kişandine. Bêguman, ev fedakarî û êşa jina kurd vala neçûye. Di pêvajoya 30-40 salên dawîn de, di têkoşîna neteweyî û demokratîk de jina kurd, hem di warên neteweyî û sîyasî de, hem jî di warên têgehîştina mafên xwe yê taybetî de pêşketineke berbiçav nîşan daye. Jina kurd, di berxwedan û protestoyên li ber derîyên zînanan de, di beşdarîya şerên çekdarî de, di xebat û têkoşîna neteweyî, demokratîk û sîyasî de gelek tabû şikand. Ev xebat û têkoşîna jina kurd, zanistî û têgihîştina wê ya di warên neteweyî, sîyasî û mafên jinan de geştir û berfirehtir kirîye. Ew, êdî di qada xebat û têkoşîna rizgarîxwazîya neteweyî de û di nava civatê de, xwedî cîh û rolek gelek girîng û taybetî ye. Bi geşbûna xebat û têkoşîna rizgarîya neteweyî ya Kurdistanê, beşdarîya jina kurd ya nava vê xebat û têkoşînê jî berfirehtir dibe. Di vê qonaxê de, di gelek qadên têkoşînê de jina kurd, di sazî û çalakîyên demokratîk de, her ku diçe bi giranî cîyê xwe distîne.

Di nava sînorên mafdar û rewa de, mafê her beşên civatê yê xwebirêxistinkirinê heye. Jina kurd nivê civatê pêk tîne. Weke her beşê civatê, divê jin jî bi awakî azad xwe bi rêxistin bikin. Birêxistinbûna jinê, mafê wê yê herî xwezayî ye û ev maf garantîya pêşketin û azadîya wê ye. Weke mîletê Kurd û kurdistanîyan; rizgarî û azadîya jinê jî bi destxistina mafên welatekî serbixwe, miletekî azad û civateke demokratîk ve girêdayî ye. Bêguman, ev nayê wê maneyê ku xebat û têkoşîna jinê bê paşguhkirin. Berevajîyê wê, divê xebat û têkoşîna jinê berfirehtir û geştir bibe. Herweha divê bê zanîn ku di welatekî de û di serî de, mafê xwebirêxistinkirin û azadîya jinê pêk neyê, civateke demokratîk jî nayê damezrandin.

Di parastîna zimanê dayikê û kultura kurdî de, roleke sereke ya jin û dayika kurd heye. Li hemberî asîmlasyon û jenosîda li ser zimanê kurdî, kozik û çepera herî girîng ya mîletê Kurd, ev rola jina kurd e. Ne bi saya serê jin û dayikên kurdên ku li malên xwe bi zarokên xwe re bi kurdî dipeyivin bûna; wê asîmîlasyon û jenosîda li ser zimanê kurdî, gelekî diwartir û berfirehtir bûya. Lê mixabin, ew rewş ji ber wêrankirina gund û bajarokên Kurdistanê û koçberîya ber bi bajar û metropolan, her ku dihere hejartir dibe. Êdî dayikên kurdan, weke berê bi zarokên xwe re bi kurdî napeyivin û ev ji bo pêşeroja zimanê kurdî metirsî û xeterek gelekî mezin e. Ji ber vê yekê jî divê tevgera neteweyî û demokratîk ya Kurdistanê, di vî warî de xwedî sîyaset, program û projeyên taybetî be; bi awakî lezgîn xebat, têkoşîn û kampanyayên mayinde li dar xîne; piştgirîya xebat û kampanyayên di vî warî de hene bike. Ji ber ku zimanê dayikê, li Bakurê Kurdistanê, li hemberî asîmîlasyon û jenosîdeke berfireh rû bi rû maye.

Loma jî divê tevgera neteweyî û demokratîk ya Kurdistanê, li hemberî vê asîmîlasyon û jenosîde sîyasetek objektîf û taybetî amade bike û bi programên demdirêj û rojane mudaxeleiyê pêvajoyê bike. Bi vê aramancê, divê platformên xebat û têkoşînê yê pêwîst bêne avakirin; piştgirîya platform, xebat û lêkolînên di warên ziman, çand û edebîyatê de bêne kirin û ev xebat bêne teşwîq kirin. Ji bona zimanê kurdî di serî de di nava malbatê de û herweha di hemû qadên civatê û jîyanê de bibe zimanê axaftin û pêwendîyê, divê xebatên pêwîst û tedbîrên acil bêne girtin.

Pirsa ciwanan

Weke her civatê, di civata Kurdistanê de jî ciwan, endamên civatê yên herî zîndî û dînamîk in. Di dîroka me ya nêzîk de, di avakirina DDKOyan, di warê îdeolojîk, sîyasî û rêxistinî de, di warê xebata eşkere û demokratîk de, di şerê çekdarî yê ku li derdora 35 salan dom dike de, ciwanên kurdan herdem di refê pêşî yê têkoşînê de cîyê xwe sitendine. Di vê pêvajoyê de, ciwanên kurdan berdêleke giran dane û hê jî didin. Ji niha û pê ve jî eger berê wan ber bi armancên sîyasî yên rast bêne vekirin, ciwanên kurdan wê di guherandina çarenûsa milletê Kurd de, rolên gelek girîng û çalak bilîzin.

Lê di warê aborî, civatî, çandî, sîyasî û rêxistinî de, pirsgerêkên ciwanên kurdan yên taybetî û girîng hene. Divê mirov bi awakî ciddî li ser van pirsgerêkan bisekine û ji wan re çareseriyê bibîne. Ciwan, ne bi serê xwe çînek civakî ne û ne jî di nava xwe de homojen in; kategoriyek ji her çîn û tebeqeyan pêk tê. Ciwanên xwendekar, tenê beşek ji ciwanan ne. Di têkoşîna neteweyî û demokratîk de, pirsa perwerdekirin û xwebirêxistinkirina ciwanan, bi serê xwe mijareke gelek girîng û zîndî ye ku divê mirov bi hûrgilî li ser raweste. Divê ciwanên kurdan bi helwest û çalakîyên xwe weke dînamîkek girîng, di têkoşîna neteweyî û demokratîk de cî bigrin. Ji ber ku ciwan yek ji dînamîkên pêşketin û geşkirina tevgera neteweyî û demokratîk in.

Yek ji wezîfeya ciwanên kurdan yê sereke jî ew e ku bi evîndariyek neteweyî, hînî dîrok, ziman û çanda xwe bibin. Divê ew di vî warî de, xwe perwerde bikin û xwe bi rêxistin bikin. Loma jî, ji bo her ciwanê kurd, divê hînbûna dîroka neteweyî, çand û zimanê wî bibe doz û armanceke sereke. Ji ber ku ciwanekî ji zanîn û hişmendîya neteweyî bêpar, neperwerdekirî û bêrêxistinî, wê ji şexsîyet û civata xwe bi dûr keve û bi hêsanî asîmîle bibe.

Divê ciwanên kurdan, di her waran de xwe pêş bixin û rêxistinên xwe yên neteweyî pêk bînin. Lê divê tevgera neteweyî û demokratîk ya Kurdistanê jî girîngiyek taybetî bide xebata ciwanan û ji bo wan bername û projeyên taybetî bêne amadekirin. Ji bona ku ciwan bikaribin di warê neteweyî, civatî, teorîk û çandî de xwe perwerde bikin, divê alîkarî û piştgirîya wan bê kirin.

Yekîtiya Kurdistanê armancek demdirêj e

Kurd, civakeke dîrokî ye ku di şert û mercên kolonî de pêvajoya netewebûnê dijî. Milletê Kurd û welatê wî Kurdistan bi darê zorê, di nava çar dewletên kolonyalîst de hatêye perçekirin û dabeşkirin. Ev rewş, di rûxandina dînamîkên hundurî yên civata Kurdistanê û rola neyênî ya pêvajoya netewebûna kurdan de, rola sereke ye. Ji ber vê yekê, di nava perçeyên Kurdistanê de, di warê aborî, civakî, sîyasî û heta olî û kulturî de, cûdayî têne jîyandin. Ji ber rewşa perçebûnê, di warê awayên têkoşîna sîyasî de jî cihêti derdikevin holê. Di vê dema ku Başûrê Kurdistanê ber bi dewletbûnê ve dihere, li perçeyên din yên Kurdistanê, gelên Kurdistanê hê ji mafên herî kêr û xwezayî yên mirovî jî bêpar in. Di vê rewşa dabeşkirî ya welat û netewe de; di programên rêxistinên sîyasî yên kurdan de, meyla di giranîyê de her perçe li gorî rewşa xwe pirsê çareser bike. Ev jî di her perçeyî de beramberî dewletek serbixwe, federasyon ya jî otonomîyê dike.

Perçebûn û dabeşkirina Kurdistanê, rastîya dîrokî ya ku di cografya Rojhilata Navîn de hebûna yekwelatîya Kurdistanê ji holê ranake. Kurdistan, weke dîrokî, welatê kurdan û

pêkhatayên kurdistanîyan e. Yekîtiya miletê Kurd û Kurdistanê mafekî dîrokî, neteweyî, sîyasî û hiqûqî ye. Ev maf, ne tenê ji bo kurdan û welatê wan, li dinyayê ji bo her gel û neteweyekî mafekî meşrû û rewa ye. Ji ber vê yekê; em alîgirê hemû welat û gelên dinyayê yên perçebûyî ne.

Yekîtiya Kurdistanê û miletê Kurd, ne tenê mafek e, di heman demê de ji bo kurdan armancek stratejîk e. Pirs, wê ev maf çawa bê bikaranîn û wê ev armanc çawa bê pêkanîn. Loma jî pirsê yekîtiya Kurdistanê, divê weke yek ji armancên programa demdirêj ya tevgera neteweyî û demokratîk ya Kurdistanê bê dîtin. Pêkanîna vê armancê, bi rewşa dîrokî ya giştî û îradeya miletê Kurd ya wê rewşa dîrokî ve girêdayî ye. Ango pêkanîna yekîtiya miletê Kurd û Kurdistanê, pirsêk pêvajoya dîrokî ya demdirêj e. Ev pêvajo wê bi kîjan alî ve pêşve, bi têkoşîna kurdan, dînamîkên hundurî yên pêşerojê yên civata kurd, faktorên derve û bi şert û mercên navneteweyî ve girêdayî ye. Pirsê yekîtiya Kurdistanê, gava bi kêmanî du perçeyên Kurdistanê rizgar bibe, dikare têkeve rojevê.

Yekîti û hevkarîya nav rêxistinên kurdan yên her çar perçeyan

Yekîtiya Kurdistanê, anga avakirina Kurdistanek serbixwe û yekgirtî, daxwaz, hesret û armancek demdirêj û stratejîk ya kurdan e. Her ku miletê Kurd û Kurdistanê di warê jîyana serxwebûn û azadîyê de destketinekê bi dest bixin, wê ev daxwaz jî mezintir û geştir bibe. Wezîfeya tevgera neteweyî û demokratîk ya Kurdistanê, vê daxwazê zindî bihêle, pêş ve bibe û ji niha ve ji bo pêkanîna şertên dîrokî yên yekîtiya her çar perçeyên Kurdistanê bixebite.

Zindîhiştin û geşkirina vê bîr û bawerîya stratejîk û pîroz, bi rêvebirina xebat û sîyaseta rêxistinên kurdistanî yên her çar perçeyan ve girêdayî ye. Di vî warî de pêwendî, xebat û awayên xebata avakirina şert û mercên yekîti û hevkarîyên nav hêzên Kurdistanê yên her çar perçeyan gelekî girîng in. Berî her tiştî, divê yekîti û hevkarîyên di nava rêxistinên her çar perçeyan de, weke têkilîyên nava hêzên sîyasî, demokratîk û welatparêzên yek neteweyî bêne dîtin. Pêwîst e ku ev têkilî li ser bingehê biratî, yekîti, yekrêzî û hevkarîya neteweyî bêne avakirin. Divê ew pêwendî, hevkarî û yekîti ji awa û metodên bikaranîna zor û zordariyê dûr û li ser esasê rexnekirin û lixwerexnegirtinê yên demokratîk û biratî bêne birêvebirin. Divê pirs, pirsgerêk û dijîtiyên ku di nava rêxistin û tevgera neteweyî ya Kurdistanê de derkevin holê, bi rêyên dîyalog û bi metodên aşî û demokratîk bêne çareserkin. Divê pevçûnên hundurîn û şerê biratîyê bi carekê ji holê bê rakirin û bê qedexekirin. Di vî warî de, divê biryarên pîrensîpî bêne girtin. Di rastîya xwe de, divê qanûneke hevbeş ya neteweyî ya li ser esasê wekhevî, biratî û rêzgirtinê bê amadekirin û ev ji hemû rêxistin û raya welatparêz ya Kurdistanê re bê pêşkêş kirin. Di vî warî de, wezîfeyek mezin jî dikeve ser milên hiqûqnasên kurdan. Divê têkilîyên nava rêxistinên welatparêz û demokratîk yên her çar perçeyên Kurdistanê, li gorî vê qanûnê bêne birêvebirin.

Pêwîstîya tevgera rizgarîxwazîya neteweyî ya her çar perçeyan bi yekîtiyek hevbeş û sîwanî ya neteweyî û kurdistanî heye. Rêxistin û yekîtiyek weha ya hevbeş û sîwanî, dikare pêwendî û hevkarîya nav her çar perçeyan li gorî hiqûqek navxweyî ya hevbeş pêk bîne. Divê ev rêxistina sîwanî, di warê hinek pirsên hevbeş û navxweyî yên kurdan de, bikaribe pêşniyaran bîne û ji bo çareserkirina pirsgerêkan bibe referans. Awayê rêxistin û yekîtiyek weha, desthilatî û birêvebirîya wê, divê di encama pêwendiyên nav rêxistin û tevgerên neteweyî yên her çar perçeyan de û bi îradeyek hevbeş bê tespît kirin.

Dinya di nav lêgerîna nîzamek nû de ye

Di dawîya sedsala 20an de dinya bû qada pêşketin û guherandinên girîng. Belavbûna Yekîtiya Sovyetan û Bloka Sosyalîst yek ji van pêşketinên girîng e. Piştî belavbûna Yekîtiya Sovyetan, dawî li rewşa duserîtiya dinyayê û şerê sar hat. Îro, li cîhanê rewşek navneteweyî ya nu tê jîyandin. Dinya di nav lêgerîna nîzam û balansek nû de ye.

Heta van demên nêzîk, di nîzama dinyayek yekserî de, Dewletên Yekbûyî yên Amerîkayê (DYA) roleke sereke hilda ser milê xwe. Sazûmana kapîtalîst-empyeralîst, li hemberî dinyayê xwest ku xwe weke bêalternatîf nîşan bide. Serkêşê sazûmanê DYA ji bo sîyaseta xwe bi ser xîne, xwest ku sîyaseta xwe ya “Nîzama Dinyaya Nû” bi cîh bike. Lê ji aliyê din ve, li gorî giranîya xwe hinek welatên ku di Yekîtiya Ewropayê (YE) de cîh digrin, Komara Gelê Çînê, Federasyona Rûsyayê û Hindistanê rasterast, yan jî bi awayekî çivonek dijberî û dudilîyên xwe li himberî vê rewşa DYAyê nîşan dan. Di vê rewşa îro de, dinya di rêbîhurek nû de ber bi nîzamek pirnavendî û pirsêrî ve diherike.

Di rastîya xwe de, teva ku hê şerekî germ û berfireh derneketibe jî li ser bingehê berjewendîyên aborî û sîyasî yên hêzên mezin, dinya di nav berberî û şerekî sivik ya dabeşkirinek nû de ye. Çavkanîyên enerjîyê, Rojhilata Navîn û Asyaya Rojava bûne qadên herî germ yên van şer û pêvçûnan. Teva pêvajoya lezgîn ya globalîzma ku di dinya de heye jî di pêşengîya rastmalîya navneteweyî de jî li dinyayê nakokî û pevçûnên dewletên empyeralîst-kapîtalîst her ku dihere diwartir û berfirehtir dibe. Teva ku ne di asta şerekî cîhanî de be jî ev nakokî û pevçûn bêtir weke şerên herêmî û wekaletî, tifaqên navdewletî derdikevin pêş. Di pêşerojê de, wê ev pêvajoya tê jîyandin, rewşa navneteweyî û dinya ber bi belans û nîzamek çawa here, bêtir zelal bibe.

Dinya bi gelek pirsgerêkên mezin ku nehatine çareser kirin û bi bêdaletîyek dijwar kete sedsala 21an. Li dinyayê, li gelek navçeyan, hê jî gelek welat weke klononîyên klasîk di bin destan de dijîn. Kurdistan jî di nav de li Asya, Afrîka, Amerîka Latînî û hinek navçeyên din, gelek gel ji mafên xwe yên neteweyî û demokratîk bêpar in û di bin nîrê bindestîya neteweyî de dijîn. Piştî Şerê Cîhanê yê Yekem û yê Duyem li Asya, Afrîqa û Amerîkaya Latînî, gelek milletên bindest rizagar bûn û dewletên xwe yên neteweyî ava kirin. Lê mixabin, milletê Kurd jî vê rewşa lihevhatî îstifade nekir. Rewşa Kurdistanê ya weke welatekî kolonîya klasîk û milletê Kurd jî weke miletekî perçekirî berdewam kir. Nîzamên ku bi encamê bandora herdu şerên cîhanê hatin avakirin; di heman demê de, ji bo tevgera rizgarîxwazîya Kurdistanê weke “*nîzamên antî kurd û kurdistanî*” şekil girtin.

Li gelek herêmên cîhanê, ew welatên ku di bin nîrê kolonîtiyê û bindestiyê de dijîn û ji mafên xwe yên neteweyî û demokratîk bêpar in; di warê aborî û civatî de welatên ku herî bi şûndemayî ne û di nava tengezarî û hejarîyê de dijîn. Her ku diçe xwînmişî, tengezarî û xizanî zêdetir û berfirehtir dibe. Bi milyonan mirov di nava birçîbûn û hejarîyê de dijîn. Di roja me de, pirsgerêk û nakokîya herî mezin ya sereke, nakokîya di navbêna xizan û dewlemendan de ye. Li Afrîqayê û li hinek herêmên cîhanê, mirov ji birçîna dimirin. Ji ber afatên xwezayî, bi sedhezaran mirov birçî û tazî li ber dîwaran dijîn. Li pêş çavên dewletên ku şampîyonîya parastîna mafên mirovî û demokrasîyê dikin, tevkujiyên mezin çêdibin.

Îro li dinyayê pirsgerêk û nakokîyek din ya herî mezin jî di navbêna gelên bindest yên têkoşîna rizgarîxwazîya neteweyî û azadîyê didin û hêzên empyeral û dewletên herêmî yên kolonyalîst de ye. Heta ev welatên kolonî û bindest ku di nav wan de Kurdîstan jî heye rizgar nebin; nakokîyên navbêna zengîn û feqîran, bakur û başûr, serdest û bindestan, kedkar û kedxwaran neyên çareser kirin; bi awakî giştî li dinyayê azadî, aşî,

edalet, mafên mirovî û demokrasî nayê avakirin. Ji bo rewşa dinyayê bêtir ber bi xerabîyê ve neçe û rê li ber felaketên mezin neyê vekirin, divê ev nakokî û pirsgirêk miheqeq bi awayên demokratîk û mayende bêne çareser kirin û nîzamek bi edalet ya navneteweyî bê avakirin.

Lê belê, hêzên mezin yên ku serwerî li ser dinyayê ava kirine, ji sîyasetek weha gelekî dûr in. Weha dîyar dibe ku ji bo ew berjewendîyên xwe biparêzin û rewşa xwe ya heyî bidomînin, wê dev ji çekdarbûnê, derxistina şerên herêmî, tefandina têkoşîna gelan, berberîyên desthilatdariya nav xwe bernedin. Bi kurtayî, dewletên emperyalîst wê bixwazin zordarî, sazûmana xwe ya li ser esasê xwînmijî û bêdadmendîyê biparêzin. Gelek caran, dewletên mezin û emperyalîst rûmetên gerdûnî yên weke azadî, edalet, demokrasî û mafên mirovî ji bo veşartina sîyasetên xwe yên durû, bi kar tînin. Lê ya ku li dinyayê serdest e û rêberîya pêwendîyên navneteweyî dike, ne maf, ne hiqûq û ne jî edalet e. Berevajîyê vê, balansa navbêna rastmal û hêzê ye; *"yê bi hêz e, mafdar e û yê bi hêz e, bi ser dikeve"*. Ev rewş û rastî hem di qada navneteweyî de û hem jî yek bi yek di nava welatan de weha ye. Lê divê em ji bîr nekin ku gava înterese û menfeetên dewletên emperyalîst, kolonyalîst û dagîrker li hemberî xebat û têkoşîna milletên bindest têkeve tengasî û metirsîyê, teva nakokîyên di nav wan de jî ew dewlet û hêz dikarin dîsa bi hêsanî têkevin nav tifaq û peymanên *"pîroz"*.

Li welatên emperyalîst rewşa girseya kedkaran her ku diçe xerabtir dibe; bêkarî zêde dibe, mafên civatî û demokratîk yên di encama têkoşînek dûrûdirêj de hatine bidestxistin têne sînor kirin û neyartîya bîyanîyan zêdetir dibe. Ne tenê li yek û yek welatan, li seranserê cîhanê dewlemend bêtir dewlemend û xizan jî bêtir xizan dibin.

Îro, li cîhanê pirsgirêkek din jî pirsgirêka bi awakî lezgîn guherandina demografîya cîhanê ye. Ev jî ji sedemên şer, birçîbûn, xela, guherîna seqayê, pirsgirêka koçberî û penaberîya girseyî tê. Bi milyonan meriv ji ber şer, pevçûn, neheqîyên tundrewî û pirsgirêkên aborî ji welatên xwe koç dikin. Li ser rêyên koçberîyê bi xeterên man û nemanê rû bi rû dibin. Ew neçar dimînin ku xwe bavêjin bextê bazirganên mirovan û di deryayên *"bêbext"* de, bêyî ewlekarîyê, berê xwe bidin *"bihuştên"* Ewropayê. Lê mixabin, bi hezaran kes berî bigehêjin wan *"bihuştan"*, deryayên *"bêbext"* ji wan re dibin goristan.

Ji alîyê din ve, Yekîtiya Neteweyan (YN) û rêxistinên navneteweyî yên din, di çareserkirina şerên herêmî de, di pêşlêgirtina pevçûnên etnîkî, olî û qetliamên girseyî de, di warê têkoşîna li dijî îklim û avûhewayaya cîhanî de, di pêşlêgirtina birçîbûn û felaketan de, di warê pirsgirêkên neteweyî û navneteweyî de, nikarin bibin xwedîyê bandoreke pêwîst. Jar û hejarîya van rêxistinan, êdî bi awakî vekirî derketîye holê. YN û rêxistinên navneteweyî yên din, divê di çareserkirina pirsgirêkan de rolekî xurttir bilîzin. Bi vê armancê, divê ew li gorî rewşa Cîhanê ji nû ve bêne reorganîzekirin û hûnandin.

Li hemberî vê pêvajoyê û rewşê, mirovayetî di nava lêgerînek germ de ye. Mirovên ku ji bo pêşerojê rêya rizgarîyê nabînin, bêtir ber bi tevgerên paşverû, olperestîya radîkal, tundrew, nijadperest, terorîst û neyartîya bîyanîyan ve diçin û tevgerên weha bi hêz dibin. Li cîhanê, nakokî û xetera şer û pevçûnên di navbêna ol û mezheban de mezin dibe. Rêxistinên radîkal û terrorist yên weke DAÎŞ, El Qaîda, Talîban, Heşdî Şabî, Şebab û hwd zêdetir û xurttir dibin. Felsefeya kapîtalîzmê ya kedxwarî û qezencê, bi awakî giştî hêjayîyên mirovî û ehleqî pûç û kavi kirîye. Her tişt jî bo qezenckirin û dîsa qezenckirinê ye. Nîrxên xirab yên di warê aborî û civakî de takekesîtî, kêspereştî, *"yê keşfîya xwe rizgar bike qaptan e"*, ruşwet, bêpersiyartî, *"yê bi hêz e mafdar e"*, û hwd her ku dihere, di nava civatê de bêtir cîh digrin. Ev tişt hemû taybetmendîyên xwezayî yên kapîtalîzmê ne.

Sedemên bingeha pirsgirêkên tengezarîya aborî, kedxwarin, birçîbûn, sefalet, şer û bêdadî sazûmana kolonyalîstî û kapîtalîzmê ye. Di pêvajoya dîrokê de kapîtalîzma ku li ser kolonyalîstî û mîrasa kedxwarina gelan pêş ketîye, heta îro ji bo mirovatîyê nebûye rêya rizgarîyê û di pêşerojê de jî wê nebe. Kapîtalîzm, sîstem û sazûmanek bi xwe re ne li hev e û ji ber nakokîyên navxweyî hergav qeyran û tengezarîyan diafirîne.

Li hemberî van guherandin û bûyerên xeter, metirsîdar û neyênî, ji bo îro û pêşeroja mirovahîyê bûyer û pêşketinên erênî yên girîng jî çêdibin. Edalet, wekhevî, azadî, demokrasî, parvekirinek dadmendî, mafên mirovî, mafên jinan, parastîna xwezayê û hwd li seranserî dinyayê bûne dîyardeyên girîng û hêjayîyên gerdûnî. Ji bûyer û rûdanên erênî yek jê jî guherandinên sîyaseta di warê “*têkelnebûna hundirî*” de ye ku yek ji berhemên sîyasatên dema şerê sar bû. Mafên mirovî, demokrasî û mafê azadîya fikrî êdî ji pirsgirêkên hundirî yên dewletan derdikevin û bi peymanên navdewletî dibin pirsgirêkên navneteweyî. Tevgerên ji bo parastîna xwezayê, çalakîyên li hemberî mîlîtarîzmê, tevgerên li hemberî globalîzmê, tevgera mafên mirovî û hwd divê di avakirina rista navneteweyî ya nû de û di şikilgirtina cîhana pêşerojê de, bêtir xwedî bandor bin û weke tevgerên xwedîyê mafê gotinê bêne dîtin. Ji bona ku ev tevger û rêxistin bibin xwedîyê bernemeyek hevbeş û çalaktir bibin, divê hêzên pêşverû û demokratîk van rêxistin û tevgeran ji qadên herêmî derxînin û wan bighînin astek navneteweyî.

Pêwîstîya cîhanê ji nixê gerdûnî yên mirovî û demokratîk heye. Sazûman û nîzama navneteweyî ya pêşerojê, divê li ser bingehê van nirxan bê damezrandin. Li cîhanê aştî, edalet, azadî, demokrasî, mafên mirovî, îstiqrar û parvekirinek dadmendî encax li ser vê bingehê bê avakirin.

Rojhilata Navîn di pêvajoyeke nû de derbas dibe

Piştî Şerê Cîhanê yê Yekem Rojhilata Navîn ji nû ve hate parve kirin û nexşeya herêmê ya sîyasî ji aliyên dewletên serketî ve carek din hate xêz kirin. Ev herêm, di navbêna Brîtanya û Fransayê de hate dabeşkirin. Di vê parvekirinê de, rewşa kolonîya klasîk ya Kurdistanê berdewam kir. Kurdistan, di nav Tirkîye, Îran, Iraq û Sûrîyeyê de weke kolonîyeye klasîk ma. Ji ber vê yekê, di perçekirina Kurdistanê û li ser vî esasî, di parastîna û berdewamîya dezgehên kolonyalîstîyê de, di serî de Brîtanya û Fransa, dewletên emperyalîst rola sereke lîstin. Ji bo ku piştî DYA jî beşdarî nav vê pêvajoyê bû, ev hêzên navborî şîrîk û berpîrsîyarê domandina kolonyalîzmê li Kurdistanê ne.

Piştî Şerê Cîhanê yê Duyem jî Rojhilata Navîn bû qada têkoşînek dijwar ya nufûz û hegemonyaya navbêna bloka emperyalîst û sosyalîst. Teva ku li hinek dewletan derbeyên leşkerî û guhertinên rejîman çêbûn jî di statukoya ku li herêmê hatibû damezirandin de guhertineke girîng çênebû; hêzên mezin rê nedan statuya ku li ser destên wan hatibû avakirin, bê guherandin.

Belavbûna Yekîtiya Sovyetan û Bloka Rojhilatê li Rojhilata Navîn rê li ber guherandin û bûyerên nû vekir. Bi hilweşandina Sîstema Sosyalîst, sîyaseta DYA ya li hemberî berfirehbûna Yekîtiya Sovyetan û “*tehlûkeya komunîzmê*” hate guherandin û êdî girîngîya sîyaseta parastîna û neguherandina statûya Rojhilata Navîn jî weke berê nema. Loma jî DYA dest bi sîyasat û planên guherandina rewşa herêmê kir. Ev sîyasat û rewşa nû ji bo tevgera neteweyî ya Kurdistanê jî bû kês û firsendek. Di statukoparastîna herêmê de pencereyek vebû; astengên derve yên li pêşîya tevgera Kurdistanê ku sûcê sîyaseta hêzên desthilatdar bûn, heta radeyekê ji holê rabûn. Sîyasatên di dema şerê sar yên ku di encamên rewşa statukoparêzîyê de derdiketin holê, êdî ji bo DYAyê dibûn

bargiranî. Loma jî DYA, weke beşekî avakirina "Sazûmana Cîhana Nû", ji bo Rojhilata Navîn sîyaseteke nû xist rojevê. Sîyaseta DYAyê ya bi navê "Projeya Mezin ya Rojhilata Navîn" di heremê de guherandin û pêşketinên nû derdixîne holê. Rojhilata Navîn yek ji herêmên cîhanê ye ku herî pir di nava pirsgirêk û aloziyan de dijî. Pirsgirêkên neteweyî yên vê herêmê nehatine çareserkirin. Li vê herêmê pirsgirêkên olî, mezhebî û neteweyî ketine nav hevdû. Berberî û têkoşîna li ser kanîyên neftê bi dijwarî berdeham dike. Rewşa şerê germ hîna ji holê ranebûye û ev rewş her ku diçe germtir dibe.

Mudaxeleya DYAyê ya Iraqê di heremê de bû sedemê pêvajoyek nû û pêşîya hinek bûyer û guherandinan vekir. Ev bûyer û guherandin dewletên kolonyalîst yên weke Tirkîye, Îran, Sûrîyeyê û hinek rejîmên kevneperest yên herêmê xistin nav metirsîyek mezin. Ew dewlet û rejîmên kevneperest bi her awayî hewl didin ku rewş û statukoyên xwe biparêzin û bidomînin. Guhertin bi kêrî wan nayê û ji ber vê yekê jî li dijî guherandin û bûyeran in. Di vê rewşê de sîyaseta dewletên kolonyalîst û hinek rejîmên kevneperest yên statukoparêz yên herêmê û sîyaseta DYAyê ya niha ku ji guherandinan re vekirîye, li dijî hev in. Ev rewş, bi awakî giştî derfetên girîng ji bo tevgera neteweyî ya Kurdistanê derdixîne holê. Divê miletê Kurd û tevgera rizgarîxwazîya neteweyî ji vê kêş û rewşê baş îstîfade bike.

Armanç û sîyaseta tevgera neteweyî û demokratîk ya Kurdistanê ji destpêkê ve li gel guherandin û ji nû ve sazkirina herêmê ye. Loma jî daxwaz û sîyaseta kurdan û sîyaseta DYAyê ku niha li herêmê dimeşîne, guncav û lihevhatî ye. Rewşa ku meriv îro li Iraqê û Başûrê Kurdistanê dibîne; hevkarî û piştgirîya DYAyê ya bi hêzên neteweyî yên Başûrê Kurdistanê re, ji ber vê yekê ye. Di van şert û mercan de li Iraqê pêwîstîya DYAyê ji piştgirîya kurdan heye. Şerê li dijî DAÎŞê jî vê yekê derdixîne holê. Loma jî divê kurd ji alîyekî ji vê rewşa nû îstîfade bikin; lê ji alîyê din jî divê em ji bîr nekin ku gava rewş û merc bêne guherandin, dikare sîyaseta û helwesta DYA jî bê guherandin. Di vî warî de, divê rola DYAyê ya di şikestina 1975an û bûyera 16ê cotmeha piştî referandûma serxwebûnê ku beşekî mezin ya xaka Kurdistanê ji destên kurdan derket, weke du nimûneyên balkêş neyên ji bîr kirin. Loma jî divê tevgera neteweyî û demokratîk ya Kurdistanê ji hêlekê ji vê rewş û sîyaseta DYAyê îstîfade bike, lê ji hêla din jî li hemberî îhtîmalên guherandina rewş û sîyaseta DYAyê û dewletên emperyal, bi haydarî tevbigere û di pêwendiyên navneteweyî de xwedîyê alternatîfên cihê be.

Guherandin û bûyerên ku li Rojhilata Navîn dest pê kirin û destketinên Başûrê Kurdistanê dewletên dagirker xistin nav metirsîyek mezin. Di nava Tirkîye, Îran, Iraq û Sûrîyeyê de trafîka dan û stendinên bi dizî û eşkere bi awakî piralî berdeham dikin. Armanca hevbeş ya dewletên dagirker, berî her tiştî pêşî li ber vê pêvajoya li Başûrê Kurdistanê ya ku ber bi dewleteke serbixwe ve dihere, bigre û desthilatîya federal ya Herêma Başûrê Kurdistanê ji holê rake. Divê hemû hêz û tevgerên kurdistanî li hemberî van plan û êrîşên piralî, weke yek netewe rawestin û parastîna destketinên Başûrê Kurdistanê weke wezîfeyeke dîrokî û neteweyî bibînin. Kerkûk dilê Kurdistanê ye. Di vê pêvajoyê de, divê dilê her kurdekî ji bo Başûrê Kurdistanê, Rojavayê Kurdistanê û "bihušta" ser rûyê erdê Efrînê bavêje. Divê hemû rêxistin û partiyên kurdan li hemberî sîyaseta dewletên kolonyalîst û bi taybetî sîyaseta dewleta Tirk û Îranê ku dixwazin kurdan bera ber hevdû bidin, bêtir şîyar bin û di vî warî de bi balkêşî û berpîrsîyarî tevbigerin.

Tirkîyê di rêveqetîneke dîrokî de ye

Dewleta Tirkîyeyê li ser kaviîlê împaratorîya Osmanî û pêmayên wê yên kolonyalîst hate ava kirin. Dewletek li ser esasê înkara miletê Kurd û kêmteweyan hatîye damezrandin.

Dewleteke kolonyalîst, mîlîtarîst, nîjadperest, asîmîlasyonîst û totalîter e. Ji roja ku ava bûye, di vê rewşa dewleta Tirk ya bingehîn de, tu guhertinek esasî çê nebûye. Vê dewletê di seranserî dîroka xwe ya 100 salî de, ji alîyêkî hemû serhildan û tevgerên neteweyî yên Kurdistanê bi awakî hovane û komkujîyan tefandîye; ji alîyê din jî bi zilm û zoradarîyeke mezin, pêşî li ber geşbûna tevgerên civakî, şoreşgerî û demokratîk yên tirkan girtîye.

Di easasê xwe de dewleta Tirkîye, bi destê leşkeran hatîye avakirin. Ji roja hatîye avakirin û vir de jî ev dewlet di rastîya xwe de ji alîyê leşkeran û *"dewleta kûr"* ve tê birêvebirin. Li Tirkîyeyê di navbêna hukûmetbûn û desthilatîyê de cudabûnek mezin heye. Her çiqasî li ber çavên xelkê, weha xuya dike ku dewlet ji alîyên hukûmetên sîvîl ve tê birêvebirin jî lê di rastîya xwe de tu hukûmet ne xwedîyê desthilatdarek rasteqînî ye û ev rewş îro jî weha berdewam dike. Li Tirkîyeyê xwedîyê dewletê û yê di warên biryarên *"gîrîng û heyatî"* de gotina dawî dibêje *"dewleta kûr"* e.

Hêz û dezgehên dewleta Tirk û mafya di gelek waran de bi hevdû re dixebitin. Gelek kes neçar dimînin ku pîrsgirêkên xwe yên aborî û sîyasî bi rêya rêxistinên neqanûnî û li ser destên mafyayê çareser dikin. Ji bo ku rêvebirên dewletê zordarî, ruşwet, qaçaxî û talanîya xwe bimeşînin, hertim *"dijminên hundir û derve"* diafirînin. Li hundir komunîst û kurdan, li derve jî dewletên cîran û demdeman jî dewletên din weke dijmin nîşan didin. Ji bo xelkê xwe bixapînin desthilatdarên dewletê weke plaka xerabe her tim ji xelkê re progogandaya *"ji tirkan pêve dostên tirkan tuneye"* dubare dikin. Di her demê de karbidestên dewletê, kurdan wek dijminê esasî û hedef nîşan dide. Dewleta Tirk, êdî qîma xwe bi tundrewî, teror û dagirkerîya hundurê *"sînorê"* xwe nayne; dagirkerî û terora xwe îxracî perçeyên din yên Kurdistanê, Sûriye, Îraq, Lîbya, Qarabaxê û hwd dike.

Tirkîye di nava tengezarî û krîzek mezin ya sîyasî, aborî, îdarî û dîplomasiya navneteweyî de ye. Teva piştgirî û alîkarîya navneteweyî, Tirkîye nikare tu çareserîyê ji krîz û tengezarîya aborî, sîyasî û civatî re bibîne. Krîz û tengezarîya rejimê ya ku her ku diçe girantir dibe, domdar û sazûmanî ye. Barê giran yên tengezarîya aborî, li ser milên karker, kedkar, esnafên biçûk û navîn in. Dewlemend bêtir dewlemend û xizan jî bêtir xizan dibin. Hukûmeta AKPê ya ku ji girseyên gel yên fireh re soza rê, kar, azadî, dadmendî, demokrasî û hwd dabû, bi kiryarên xwe eşkere kir ku ji hûkûmetên berê ne cuda ye. Teva hinek hewldanên şeklî yên weke *"pêvajoya aştiyê"* û propogandayên ji bo beşekî kurdan bixapîne jî di eslê xwe de hukûmeta AKPê jî ji bo çareserkirina pîrsgirêka Kurdistanê ne xwedîyê sîyasetekê cihê ye. Niha jî ev hukûmet bi awakî pir zeel dibêje ku *"pîrsgirêka Kurd"* êdî tune ye. Ango sîyaseta kevneşopîya Komara Tirkîye ya dagirkerî û kolonyalî; zilm û zoradrîya li ser partî, rêxistin, komele, dezgeh, sîyasetmedar û rewşenbîrên kurdan û asîmîlasyona li ser miletê Kurd her berdewam dike.

Tirkîye ne tenê di sîyaseta xwe ya hundir de, di sîyaseta xwe ya derve de jî ketîye tengasî û quncikê. Sîyaseta Tirkîyeyê ya Rojhilata Navîn îflas kirîye û li herêmê tecrît bûye. Bi hevkarê xwe yê stratejîk DYA re jî nakokî û pîrsgirêkên giran dijî. Yek ji astengên li pêşîya sîyaseta guherandinên li herêma Rojhilata Navîn ya DYAyê jî dewleta Tirkîye ye. Di van salên dawîn de, di bingeha xerabûna peywendîyên di nava DYA û Tirkîyeyê de, roleke taybetî ya vê sîyasetê heye. Tirkîye, di dîroka xwe ya sedsalî de tucarî ewqas bi tenê nemaye. Navbêna wê û cîranên wê ne baş e. Bi taybetî ji ber pîrsgirêka kurdî bi her kesî re di nav berberî û pevçûnan de ye. Di sîyaseta xwe ya balansî û şantajwarî ya navbêna DYA û Rûsyayê de jî ketîye quncikê.

Pirsa Kurd û Kurdistanê pîrsa herî mezin û acîl ya Tirkîyeyê ye. Di şûna ku Tirkîye vê pîrsê çareser bike; bi hemû hêz, dezgeh û îmkanên xwe êrîşî ser tevgera rizgarîxwazîya

Kurdistanê dike û dixwaze hebûna milletê Kurd ji holê rake. Dewleta Tirk, ne tenê dijminatîya milletê Kurd û tevgera rizgarîxwazî ya Bakurê Kurdistanê dike; herweha ew dijminatîya kurdên li perçeyên din yê Kurdistanê jî dike. Petrola Kerkûk û Mûsilê hergav îştaha dagirkerîya dewleta Tirk kişandîye. Dewleta Tirk, ji bo 30 mîlyon kurdên Bakurê Kurdistanê mafên herî biçûk jî nasnake; lê xwedêgiravî ji bo mafên turkmenên li Başûrê Kurdistanê, dev ji xewn û xeyala dagirkirina Kerkûk û Mûsilê bernade. Loma jî mirov dikare bibêje ku bi vê sîyaset û armanca xwe metirsî û tehlûkeya herî mezin ya li hemberî destketên Başûrê Kurdistanê dewleta Tirkîyeyê ye. Sererkanîya Giştî ya Tirk ji bo destketên dîrokî yê li Başûrê Kurdistanê jî holê rake, bi destên *"hêzên tarî yê dewleta kûr"* li herêmê provakasyonên piralî û cihêreng li dar dixwe. Êrîşên leşkerî yê bi behaneyê hebûna PKKê li Başûrê Kurdistanê, roj bi roj berfirehtir û diwartir dibin. Tirs û xofa şîyarbûna neteweyî, destketin û pêşketinên tevgera rizgarîxwazîya Kurdistanê û bêçaretîya li hemberî çareserkirina pirsgerêka Kurdistanê, karbidestên dewleta dagirker û civat xistîye nav paranoyeke diwar.

Dewleta Tirkîyeyê ku heta îro bi piştgirîya dewletên derve dikarîbû vê sazûman û hebûna xwe bidomîne, êdî hatîye dawîya rêveqetîneke dîrokî. Teva hemû hewldan û zordanên sazîya dewletê ya 100 salî, bingehê vê dewleta dagirker diheje û gelek sazîyên wê yê weke *"zîyaret"* dihatin dîtin, hildiweşe.

Herweha zordana pêşketinên dîrokî, aborî û sîyasî, gûhertinên di qada navneteweyî û herêmî de, qonaxa ku tevgera neteweyî û pirsgerêka Kurdistanê gehîştîyê, pêvajoya Yekîtîya Ewropayê û hwd, bandorên hundur û derve, dewleta Tirkîyeyê mecbûrî guherandinên bê dilê wê dike. Teva ku di vê qonaxê de, Tirkîye hê di destpêka vê povajoyê de be jî lê rewşa heyî dîyar dike ku wê pêvajoya guherandinê roj bi roj berfirehtir û kûrtir bibe.

Bêguman, ev pêvajo ji bo civata Tirk, pêvajoyeke ku bi nakokî, pevçûn, zor, zehmetî û qolincan lihevpeçayî ye. Di pêvajoya Yekîtîya Ewropayê de, di çareserkirina pirsgerêka Kurdistanê de, di pêkanîna normên demokrasîyê û hwd de, nakokî û pevçûnên di navbêna hinek alîyên dewletê de berfirehtir û kûrtir dibin. Lê ew hêzên li hemberî pêşketin û guhertinê radiwestin, nikarin pêşîyê li ber misogerîya vê guherandinê bigirin.

Pêvajoya berendametîya Tirkîye ya Yekîtîya Ewropayê

Teva ku dewleta Tirk weke welatekî berendamê Yekîtîya Ewropayê hatîye pejirandin jî ew di warê pirsgerêka Kurd û Kurdistanê de sîyaseta xwe ya kevnare û kufikî ya ku li ser înkâr, asîmîlasyon, şidet û rûxandinê ava kirîye, didomîne. Heta ku li Tirkîye guhertinên bingehîn yê sîyasî, dadmendî, desthilatî û civatî pêk neyên, hêvîkirina guhertina vê sîyaseta ji xeyalperestîyê pê ve ne tiştêkî din e. Hukûmeta AKPyê di desthelatdarîya xwe ya pêşîn û duyemîn de, ji bo ku Tirkîye bike endamê Yekîtîya Ewropayê, ji bo *"sererastkirina"* hinek pirsgerêkan û herweha di warê *"pirsa kurdî"* de hinek gavên kulturî avêtin. Lê di bingehê xwe de, ev gavên hatin avêtin ji xweşkirin û xapandinê pê ve ne tiştêkî din bûn. Karbidestên dewletê, ev guherandin ne ji bo gelên xwe û demokratîzekirina dewletê dikirin; wan dixwestin bi hinek guherandinên şiklî û vîtrînî, Tirkîyeyê teva pirsgerêk û alozîyên xwe têxin Yekîtîya Ewropayê. Lê endamên YE bi vê sîyaseta *"canbaziya şerqê"* ya Tirkîyeyê nehatin xepandin û bi awakî zelal dîyar kirin ku ew bi vî awayî, derîyên xwe ji dewleta Tirkîye re venakin.

Demekê, gelek sîyasatmedarên kurdan jî li pêvajoya endametîya Tirkîye ya Yekîtîya Ewropayê bi erênî dinerîn û ne li hemberî endametîya Tirkîyeyê bûn. Lê têgihîştin û hêvîyên civata Kurd, sîyasatmedar û rewşenbîrên kurdan yê ji vê pêvajoyê jî hev gelekî

cuda ne. Di vî warî de, di nav kurdan de şaşî û xapandinek giran heye. Bi gelemperî, gelek sîyasetmedar û rewşenbîrên kurdan hêvî dikirin ku wê Yekîtiya Ewropayê di warê sîyasî, aborî û çandî de Tirkîyeyê ji vê cendereya heyî rizgar bike. Wan YE weke navnîşanek ku wê kurdan ji vê rewşê rizgar bike û pirsgirêka kurdan çareser bike, didîtin. Lê di eslê xwe de, wan bi helwestek weha piştgirîya endametiya Tirkîyeyê ya YE dikirin û ji bo xebat û têkoşîna endametiya Tirkîyeyê re dibûn pişt û pal. Lê di nav wextê de, hêviyên vê derdorê yê ji pêvajoya endametiya Tirkîye ya Yekîtiya Ewropayê kêmbûn û hate dîtin ku ev xapandinek e.

Di pêvajoya YE de, dikare bê hesabandin ku di rewşa kurdan de rehetîyek nispî pêk were û dikare hinek mafên kulturî bêne nas kirin. Lê çareserîya pirsgirêka milletê Kurd û Kurdistanê, bi pêvajoya YE ve girêdan, şaş e. Ji ber ku dewletên YE, "pirsgirêka Kurd" weke pirsgirêkek neteweyî û welatî nabînin. Ew, pirsgirêkê weke perçakî pirsgirêka demokrasîyê û mafên mirovî dibînin û pêşniyarên wan yê çareserîyê ji vê çarçeweyê dernakevin. Navnîşan û cîyê çareserkirina pirsgirêka milletê Kurd û Kurdistanê ne YE ye. Ji aliyê din ve, eger kurd û kurdistanî bixwazin di pêvajoya YE û di platformên din yê navneteweyî de bibin alî û muxatab, divê pêşî yekîtiyê, hevahengî û yêkrêziya nav xwe ava bikin û xurt bikin; û di sîyaset, armanc û daxwazên xwe de zelal bin.

Li Tirkîye, heta pirsê milletê Kurd û Kurdistanê li gorî rastîya dîrokî neyê bi nav kirin, desthilatdarên xwedîyê dewleta Tirk, dev ji sîyasetê xwe ya dagirkerî bernedî û ji bo çareserîya pirsgirêka milletê Kurd û kurdistanîyan nexşerêyeke li gorî vê pirsgirêkê neyê tesbît kirin; wê di warê demokratîzekirina Tirkîye û endametiya YE de jî tu encamek berbiçav neyê bidestxistin. Lê li Tirkîye, ji gotin û biryarên ku têne girtin bêtir, helwest û di pratîkê de pêkanîna wan biryaran girîng in. Berî her tiştî, divê rewşa çanda li ser tabûyan hatîye avakirin û bîr û bawerîyên nîjadperestî û nehevdemî bêne guhertin. Di vê rewşa ku Tirkîye tê de ye, tu garantîya wan sozên ku têne dayin û qanûnên têne derxistin, tune ye.

Ji xwe, desthilatdariya AKP-MHPê di van salên dawîn de, li hemberî YE sîyaset û dijberîyeke pir xurt dimeşîne. Dewleta Tirkîye, ji Yekîtiya Ewropayê gelekî dûr ketîye û berê xwe daye Asyayê. Di van demên dawîn de, têkilîyên Tirkîye bi Rusya re xurt dibe. Heta, Tirkîye têkilîyên xwe yê bi Rusya re li hemberê welatên endamên YE û Amerîkayê weke şantaj bi kar tîne. Li gorî hinek derûdor û pisporên sîyasî, Tirkîye eksena xwe guhertiye û sîyasetek nû ya bi navê "Awrasya" dimeşîne.

Başûrê Kurdistanê û pêvajoya ber bi dewletbûnê

Pêvajoya bûyer û pêşketinên li Başûrê Kurdistanê û bi taybetî bidestxistina Federalîya Herêma Kurdistanê di dîroka kurdan ya nêzik de rûpelek nû vekir. Di berxwedana ji bo mafên xwe yê neteweyî de, gelên Başûrê Kurdistanê gelek qirkirin, koçkirin û rûxandinên dijwar dîtin. Lê milletê Kurd û kurdistanîyên Başûrê Kurdistanê ji salên 1990î û vir de berbanga azadiyê dijîn. Milletê Kurd û pêkhateyên Kurdistanê xelekek zincîrên koledariyê şikandine û teva hemû zor, zehmetî, dijwarî û pirsgirêkên navxweyî jî li ser beşekî xaka Kurdistanê êdî pêşeroja xwe ava dikin.

Weke tê zanin, di dîroka Kurdistanê de hîlbijartina azad cara pêşî li ser vê axê pêk hat. Li vî beşê Kurdistanê gelên Kurdistanê bi parlamentoyeke neteweyî, bi hukûmetek hîlbijartî, bi hêzên leşkerî û asayîşê, bi dezgeh û sazîyên xwe yê milî û civakî xwedîyê statuyek federal e. Ev statuya resmî, di Qanûna Esasî ya dewleta Iraqê de û di qada navdewletî de jî hatîye qebûl kirin. Referandûma ji bo serxwebûnê ya Başûrê Kurdistanê ku di 25ê îlona 2017an de pêk hat, carek din îsbat kir ku milletê Kurd û pêkhateyên Kurdistanê ji

dil dixwazin dewletek serbixwe were avakirin. Ew amade ne ku bi awakî serbixwe, azad û demokratîk li ser axa bav û bapîran bijîn. Teva pirsgirêkên navxweyî û destdirêjîyên dewletên kolonyalîst Tirkîye, Îran û Sûriye û dewletên kevneperest yên heremê; herweha erîşên DAÎŞê, Heşdî Şebî û hêzên tundrew yên navçeyê jî gelên Başûrê Kurdistanê ji dost û dijminên xwe re îsbat kirin ku ew dixwazin û dikarin xwe îdare bikin.

Divê destketinên Başûrê Kurdistanê, weke destketinên milletê Kurd yên her çar perçeyan bêne dîtin. Parastin û pêşdexistina destketinên vî perçeyî, wezîfeyeke neteweyî û dîrokî ya hemû rêxistin, tevger û partiyên neteweyî, sîyasetmedar, rewşenbîr û welatparêzên kurdan e. Bi vê bîr û bawerîya neteweyî, partî, rêxistin û tevgerên neteweyî û demokratîk yên her çar perçeyên Kurdistanê, piştgirîya desthilatdarîya federal ya Başûrê Kurdistanê dikin.

Lê mirov nikare bibêje ku li Başûrê Kurdistanê her tişt rast e, bi rêk û pêk e û di rêya xwe de dimeşe. Pêwist e ku pirs û pirsgirêkên hene, bêne dîtin û kêmanî û şaşîyên hene bêne rexne kirin. Hinek alîyên sîyasî, bi awakî menfeetperest û şelafî pirsgirêkan paşçav dikin û her tiştî weke gul û gulîstan nîşan didin. Hinek jî, ji bona xwe bi alîyekî şêrîn bikin, bi awakî bêhempa dibin piştgirê alîyekî, *"ji mîr bêtir mîrperestîyê dikin"*. Divê ji alîyekî mirov bi helwesteke rast, bi berpirsiyarîyek neteweyî û kurdistanî xwedî li destketinên Başûrê Kurdistanê derkeve û piştgirîya wan bike; lê ji alîyê din jî divê mirov bi rexneyên xwe yên dostanî û erênî bala wan bikşîne ser kêmanî û şaşîyên ku hene. Weke nimûne, neyekkirina hêzên pêşmerge û polîsan û neavakirina artêşek neteweyî ya hevbeş kêmanîyek gelek mezin e. Divê xebat û hewildanên di vî warî de, rojek berî rojekê bi dawî were û bighêje encamek mayende.

Bêguman, li Başûrê Kurdistanê awayê şikilgirtina *"sîstema federal"*, zelalkirina sînorên Kurdistanê û herweha statuya Kerkûkê, pirsgirêkên pir girîng in. Partî, rêxistin, tevger, sîyasetmedar, rewşenbîr û welatparêzên kurd û kurdistanîyên her çar perçeyan, vê rewşê ji nêzîk ve taqîb dikin.

Referandûma Serxwebûna Kurdistanê

Nîjadperestîya ereb ya ji kanîya mîrasa kolonyalîstîyê tê, heta îro jî şirîkatîyek dadmendî û wekhevîya milletê Kurd û Erebnas nake û di her firsetê de mafê gelê Kurd yê heyî jî binpê dike. Heta niha partiyên ereban, madeya 140 jî tede, naxwazin şert û madeyên Qanûna Esasî ya Iraqê pêk bînin. Dabeşkirina butçeya Iraqê ku Herêma Federal ya Kurdistanê jî şirîkê wê ye, li dijî Kurdistanê weke çekekê bi kar tîne. Li hemberî van binpêkirinên mafên gelê Kurd û neheqîyan; jibo dîyarkirin û eşkerekirina îradeya gelê Kurd ya vî beşî û bi îradeya hemû partiyên Başûrê Kurdistanê, biryara referandûma serxwebûnê hate girtin.

